kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliya navîn

bîrnebûn

ZIVISTAN 2002



NEWROZ PÎROZ BE!

15

www.arsivakurdi.org

bîrnebûn

ISSN 1402-7488

TIDSKRIFTEN UTKOMMER 4 NUMMER PER ÅR.
SÊ MEHAN CARÊ DERDIKEVE/ÜÇ AYDA BIR ÇIKAR.

UTGES AV APEC-FÖRLAG AB

HEJMAR 15, ZIVISTAN 2002

ANSVARIG UTGIVARE
Ali Çiftçi

REDAKSIYON
A. Çiftçi, B. Darı, Dr. Mikaîlî, H. Erdoğan, M.Bayrak, Î. Türkmen
M. Duran, Muzaffer Özgür, Nuh Ateş, Sefoyê Asê, Vahit Duran

ADRESS
NAVNÎŞANA LI SWÊDÊ
Box: 8121, SE 163 08, Salagatan 20 Spånga/Sverige
Telefaks: 0046-(0)8-761 24 90

E-POST
info@birnebun.com

INTERNET
www.birnebun.com

NAVNÎŞANA LI ALMANYAYÊ:
M. Özgür
Bîrnebûn Postfach 900348, 51113 Köln/Almanya
Telefaks: 0049-(0)2203-301630

BIHA/FIYATI:
Europa: 5 Euro * Türkiye: 2 500 000 TL.
(Bu fiyat eski dergiler içinde geçerlidir)

ABONE (2 yıllık bedeli):
İsveç: 400 SEK • Ewropa: 40 Euro

TÜRKIYE BANKA HESAP NUMARASı:
F. Yıldız Vakıf Bank Polatlı Şubesi
Hesap No: 00158001 445398272

İSVEÇ HESAP NUMARASI:
(Bîrnebûn) postgiro: 468 65 12-7

ALMANYA HESAP NUMARASI:
M. Özgür, Stichwort "Bîrnebûn" Deutsche Bank-Köln
Konto Nr: 5912662 BLZ: 37070060

BELAVKIRIN / DAĞITIM
Türkiye: Toplum Kitabevi / Remzi İnanç
Bayındır sok. 22/1, 0642 Yenişehir /**Ankara**
Tel: 0312/434 25 43

Medya Kitapevi/Selahattin Bulut
İstiklal Caddesi, Elhamra Pasajı No: 258/6 Beyoğlu-**İstanbul**

HOLLANDA
Neçîrvan Qilorî
Tel: 0031-62 4663655


ÇAP / BASKI
Apec-Tryck AB



Ji arşîva Dr. Mikaîlî

Her nivîskar berpirsiyarê nivîsa xwe ye. Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Bîrnebûnê re tên, serrast û kurt bike. Nivîs ger çap nebin jî, li xwedî nayên vegerandin.

www.arsivakurdi.org



Wêneyên berg:
Ji arşîva Sefoyê Asê



Naverok
İçindekiler

NIVÎSÊN BI KURDÎ

NEWROZA WE PÎROZ BE! 2
KOMCIVÎNA SAZKIRINA KOMELA ZIMAN Û KULTURA KURDÊN LI ANATOLÎYA NAVÎN 5
WAQIFA KURDÊN ANATOLIYA NAVÎN LI SWÊDE HAT AVAKIRIN 9
ŞÎN Û MIRIN 12
KILAMÊN ŞÎNA 16
LI SER JINAN ÇEND GOTINÊN BAV Û KALAN 21
KOMELA ÇANDA KURD YA GORDOXLÎ LI SWÊDÊ: 22
ALFABEYA KURDÎ YA LATÎNÎ 28
ÛSİVÊ MİHECÎR 29
HEMÊ MÛSÊ (HEMÊ GOZÊ) 34
BAJAREKÎ KU BÛYE ŞAHÎDÊ DÎROKÊ 37
DÎROKA DU NÛVEDANÊN VEXWARINÊ 43
WELATÊ MEYÊ DÎSA ÇIYAYÊN ZAGROS Û CÛDÎ NE 43
ÇARÎN Jİ HÊLÊ SARIZÊ-4 44
NAVÊN KURDA-2 46
KURTEJIYANA MIN-2 50
KUŞTINA 'TEYRÊ SER MILÊ QÎZ Û BÛKAN' DENGBÊJ FERZÊ 55
ASTRÎD LÎNDGREN 59
XELATA APECÊ YA 2001 60





TÜRKÇE YAZILAR

AÇIKLAMA 61
KÜRTÇEYE ÖZGÜRLÜK! 63
NEWROZ 65
5. ULUSLARARASI KÜLTÜR VE SANAT FESTİVALİ 68
YENİCEOBA (İNCOW) 69
KOMELA ME "ZIMAN" MA BI XÊR BE! 77
İNGİLİZ COĞRAFYA BİLGİNİ RAMSAY VE ORTA ANADOLU KÜRTLERİ 79
MURAT BOZLAK HAT STOCKHOLMÊ 82
LÎSTA NIVÎSÊN BÎRNEBÛNÊ (HEJMAR: 1-14) 83



www.arsivakurdi.org

Newroza we pîroz be!

Ew hejmara divê di serê salê de derketa, lê ji ber hinek sedeman bi derengî ket. Em ji xwendevan û dostên xwe lêborînê dixwazin. Ev derengî bû sebeba ku kovara me di meha Newrozê de derdikeve û em pê kêfxweş in ku bi vê vesîlê em ê destpêka biharê, sembola jîyanê, Newrozê, bi xeber û nivîsên xweş, pîroz bikin.

Berî hertîştî em li vir 8ê adarê, roja jina ya navnetewî, îda kurbanê û herwiha Newroza we pîroz dikin. Jiyanek xweş a bê qeza û bê bela ji we giştkaran re hêvî dikin.

Hejmara Bîrnebûnê ya yekê di zivistan sala 1997 de derketibû. Bi vê hejmara 15 an Bîrnebûn dikeve sala pênçan. Di çar salên derbasbûyî de li ser Kurdên Anatoliya Navîn pir hindik ji bo dîrokê û neslê nû berhemên hêja hatin berhev kirin û herwiha di nav Kurdên Anatoliya Navîn de bi taybetî, ji bo bi zimanê xwe deng bikin û binivîsin cesaretek hat peyda kirin. Em bi vê yekê serbilind in. Lê ji ber ku kovar li derweyî welet derdikeve, gîhêştina herkesî ne hêsan bû. Ji bo vê yekê jî pêwîst bû, ji derveyî hevalên derûdora kovarê û endamên redaksiyonê piştgiriyên hîn xurt û berfireh hebin ku ev karên ku tên kirin, ber bi profesyonelî ve herin, dakû hinek gavên din bên avêten.

Di daviya sala 2001ê de li Almanyayê Komela 'ZÎMAN' a kulturî ya Kurdên Anatoliya Navîn hat avakirin. Ew komele dê di xizmeta ziman û kultura Kurdên Anatoliya Navîn de be. Hûn ê bi kurdî nivîsa birêz Nuh Ateş û bi tirkî jî, xeberê vê komelê ji nivîsa birêz Vahit Duran bixwînin.

Li Swêdê jî disa ji aliyê Kurdên Anatoliya Navîn ve îsal û sala çûyîn du sazîyên nû hatin avakirin.

Yek bi navê *Komela Çanda Kurd ya Gordoxlî li Swêdê* ji aliyê însanên ji gundê Omê (Gordoxlî) ve çê bû. Hûn dê di vê hejmarê de hevpeyvînekê li ser avakirina vê komelê bixwînin.

Birêz Yusuf Güler li ser navê komelê, ji bo çi ew komele avakirine û pêwîstiya komelê bi zimanekî xweş bi me re sohbetek kir.

Ya didûya di 16/02-2002 de li bajarê Stockholmê Kurdên Anatoliya Navîn yên ji gund û derûdora bajarên Konya, Ankara, Kirşehîrê bi komcîvînekê, Waqifek bi navê *Stiftelsen Kurdên Anatoliya Navîn* çêkirin. Ew Waqif jî dê ji bo parastin û pêşxistina ziman, çand û nasnama kurdî kar bike. Ev hersê sazî jî dê piştgiriya kovara me, Bîrne-

www.tarsivakurdi.org

bûnê bikin. Ev ji bo me serkeftiyek e, bila ji gelê me re pîroz be. Em ji her sê sazîyan re serkeftinê dixwezin.

Xebereke din ya xweş jî ev e: me li bajarê Stockholmê bi navê *Navenda Dokumentên Kurdên Anatoliya Navîn* arşîvek saz kiriye. Armanca vê navendê; berhevkirin, tanzîm, parastin û weşandina dokumentên derbarê Kurdên Anatoliya Navîn e. Divê bê zanîn ku milletek bi dîroka xwe ve dibe millet. Milletekî bêdîrok û haya xwe ji dîroka xwe tune be nikare xwe baş bihesibîne. Ew bêkok e. Milletên xwedî dewlet di her warî de navendên xwe yên taybetî avakirine, xwediyê înstîtû û navendên lêkolînan in. Di her warî de; kultur, dîn (ol), ziman, dîrok û nasnama xwe diparêzin û bi pêşdixin. Bi neslê xwe yê nû didin nasandin û bi vê riyê urf û edetên xwe hem li gor demê diguhirînin, pêşve dibin û herwiha nasnameyeka xurt ji zarokên xwe re dihêlin. Milletê wek me kurdan ji wan tiştan bê par in. Ji bo ku bê dewlet in! Dewletên ku kurd lê dimên jî, qesî ku ji destên wan tên dixwazin wan bê nasname (bê şexsiyet) bihêlin û di nav xwe de asîmîle bikin. Di vî warî de hem li welat û hem jî li derveyî welêt di van salên dawî de gelek bûyerên berbiçav çêbûn.

Hezar carî mixabin destpêka wê salê jî ji bo kurda, bi taybetî ji bo kurdên li derweyî welêt, nemaze yên Swêdê bi xeberên xweş destpê nekir. Keça kurd, Fadime Şahîndal bi destê bavê xwe, bi dabançê hat kuştin. Sebeba kuştinê, ji aliyê bavê ve di rojnaman de wisa hat belav kirin ku Fadimê malbata xwe di mesela namûsê de li hember hemî dinyayê rezil û risva kiriye û bavê çareserkirina wê meselê tene di biryara xwe ya kuştinê de dîtîye. Piştre di mehkemê de jî, bavê Fadimê ev biryara xwe li gor medyayê tekrar kiriye.



Fadime Şahîndal Foto: Eva Tedesjö

Li ser vê bûyerê, medyaya hemû Skandinavyayê û heta li Amerikayê bi manşetên mezin rûpelên rojnama hatin dagirtin. Hîn jî makalên dûr û dirêj li ser kuştina Fadime Şahîndalê derdikevin û piranîya makalan motiva kuştinê bi kultura kurda ve girê didin.

Erê, me li jor got; jiyanek bê qeza û bela! Ev bûyer berî hertîştî ji bo malbata Şahîndal tirajediyek mezin û malbatxirabî ye! Malbata Şahîndal keça xwe ya delal a civan wenda kir. Em li vir ji bo malbata Şahîndal dibên; serê ve sax be! Qeza û bela ve giran bû. Bila Xwedê sebrekê bi we de! Em wek kovara Bîrnebûnê, vê bûyerê, motîv çi dibe bila bibe, mahkûm dikin. Wek în-

www.arsivakurdi.org

san tu heqê kesî tune ku ruhê wî/wê ji ber dîtin an jîyana ku dijî bêt stendin!

Em careka dîn dûbare dikin ku bi her awahî kuştin, li ku derê dibe bila bibe, yan motîv çi dibin bila bibin, em li hember in. Lê, divê li ser vê bûyerê rast bêt sekinandin.

Ev yeka bi mesela kurdî ya ku bê serûber ji welatê xwe derketinê ve girêdaye. Nakokiyên di navbera neslande ye. Tesîra dorûberê malbatê bi xwe ye. Sebeb wek liste dikare dûrûdirêj bêt rêz kirin. Lê, ew trajediya ku hatiye serê malbata Şahîndal wek mîlet, ne tenê di nav kurdan de, di nav her mîlletên din de jî bûne. Çi hîkmet e, dema bûyereka wisa negativ ji aliyê kurdekî/kurdekê ve dibe, bi kultura kurdan ve tê girêdan. Dema trajedî an bûyerên ji vê hîn xirabtir, ji aliyê însanekî ji mîlletekî din yan swêdiyekî ve tê kirin, tenê mesela wî însanî, tê îzah kirin. Tu cara nakin malê mîlletê wî.

Milletê bê xwedî dewlet hertim dibe "benîştê devê herkesî". Wek millet êrîşek bi zanistî ji aliyê medya swêdê ve, wek kuştina Olof Palmê, di vê mesela Fadimê Şahîndalê de jî li hember kultur û nasnama kurdî hat meşandin. Kultura kurdî, bi rojan di radyo, rojname û televizyonan de pir negatîf hat nîşandan. Tu hêz an dewletek an berpirsiyarên kurdan yên derwe, ranebûn û negotin, ku tu heqê kesî tuneye ku êrîşek wiha bê serûber bînin ser kultura milletekî û ev bûyerên negatif bi gîştî bikin malê wî milletî.

Di hejmareka me ya taybetî ku dê piştî vê hejmarê di meha gulanê de derkeve, em ê bi dûr û dirêj li ser mesela entegrasyonê bisekinin.

Heta hejmareka dîn bimînin di xêr û xwaşîyê de!

Ali Çiftçi
ali@birnebun.com

Du rojên Kurdên Anatoliya Navîn

3 û 4ê Gulanê 2002, Fittja/Stockholm

Kovara Bîrnebûn, Mångkulturellt Centrum i Fittja (Navenda Pirçandî li Fittja) û Södertörnshögskolan bi hevra du rojên kurdan amade dikin.

Ev rojên çandî, di 3 û 4ê meha Gulanê li Fittja tên çêkirin. Di van rojan de çend aktiviteyên wek; semîner, folklor, cilûberg û xwarinên kurdî wê bên pêşkeşkirin. Kovara Bîrnebûnê di meha Gulanê de, bi vesîleya van rojan wê bi zimanê kurdî û swêdî wek hejmareke taybetî bêt weşandin.

www.sivakurd.org

Komcivîna Sazkirina Komela Ziman û Kultura Kurdên li Anatolîya Navîn

Nuh Ateş

Kilamek, çîrokek an romanek bi kurdî nivîsandin û xwendin bedele hezar şîret, gotin û lomeyên bi tirkî ne.

Di rojeva me da çêkirina *Komela Ziman û Kultura Kurdên Anatolîyê Navîn* heye. Bi gotineke din, dersa me ya hûro avakirina sazîyekê ye ku hizmeta ziman û kultura kurmancên Anatolîyê bike. Emê hûro, li ser van temayan merem û nêtên xwe ji hevra biwên û guh bidin ser hev.

Sazî, dezgeh û hacet di tarîxa însanetîyê da, di jiyana civat û miletan da tim hebûne û ewê, her çiqas reng biguherin jî, tim hebin. Piçûk û mezin civatek jîyana xwe di saya sazîyan da dimeşîne. Idarekirina civatê, pêşvabirina kultur, huner û zimên bê sazî, bê dezgeh û hacet ne mumkun e. Ifadekirina heq û mirazan û videstxistina wana jî bi vê rê dibe.

Şekil û navê dezgeh û sazîyan li gora dem û dewrana, cî û waran tê guherîn. Tevgêra eşîrî û feodalî, partîyên sîyasî û dewletên netewî yek cure sazî ne. Komeleke piçûk, dersxane û mekteweke xas ji sazî ye. Di sazîyan da endam, alîgir û hewaskarên wana, sewa amanceke binavkirî û li gora qeyde-quralan bi hevra dişûxilin û dimeşin. Ew zanîn û kanîna xwe di vê rê da dikin yekquwet.

Di dema hûro da, dinê berve avakirina sazîyên hînê mezin, yên sernetewî dihere. Yekîtiya Ewropa sazîyeke sernetewî ye. Li rû an hemberî vê, trendeke (mêl) din jî heye. Berê vê berve avakirin û parastina sazîyên netevî û cîwarkî ye

Di sedsala 20 an da Kurd du caran nêzikî çêkirina sazîyên dewletî ên netewî bûn. Di nîvê sedsala bîstan da li Kurdistana Iranê Cumhurîyeta Mahabadê hatiwû saz kirin. Hîngê zimanê kurdî, cara siftê bûwû zimanê resmî û perwerdikirinê. Li pir neajot, komara Mehabadê helweşîya.

Tenê li Kurdistana Irakê, Kurd deh sal in, ku xwedîyê otonomîyê ne, meri dikanê biwê, ew serbixwe ne. Li wir zimanê Kurdî azad e û resmî ye.

Li welatên Sowyetê yên berê jî, zimanê kurdî, di wexta xwe da, bi qedrqimet wû. Bi wî weşan, radyo û mektew hewûn. Bi dehan prefesorên ziman, edebîyat û folklora kurdî ji nav kurdên kevnesowyetê derketin. Bi

www.arsivakurdi.org

eserên wana em hûro jî qirka xwe heldikşînin. Lê hûro, li pêy helweşîna Yekîtîya Sowyet, halê wana xeraw e; ew ji birbelaw in. Rewza zimanê kurdî li Tirkîyê ji a gîştikan xerawtir e. Li wir ziman û nasnameya kurdî 75 sal in, ku qedexe ye û di bin zulmeke giran de ye. Li wir, zimanê kurdî berve bîrbûn û wendabûnê dihere. Asîmîlasyona bizorê bela xwe daye zimanê kurdî û devok û zaravayên wî. Di vir da, para me jî heye û ne hendik e. Me xwe, veqasî ku em ketine pêy sîyaset û ideolojîyan, vi talîyên zimên û kultura xwe va neêşandîye û qaxîya hevîsîn, nivisîn û xwendina kurmanciyê nekişandiye.

Nimûne; li Anatolîya Navîn ji mîlyonekî zêdetir kurd bi ci û warin. Ji nav wana bi hezaran meriyên xwenda, bi heş û heyî derketine û di sîyasete kurdî da aktiv in. De tu were, ji nav kurdên Anatolîyê xeyrî istisna nivîskarekî tenê ku bi zimanê kurdî eser daye dernketiye. Li gora zanîna me ya huro, ji 330 î zêde gund, qeseba û qezayê kurda li Anatolîyê heye. Lê çi heyfe, ku li veqas cîhan ne dersxanek ne jî komelek boyî ziman û kultura kurdî tune. Ma va ne eybeke giran e?

Li welêt û li diasporaya Ewrûpa bi sedan sazîyên kurda hene. Lê piranîyek mezin ji wana sîyasî ne an jî bi partî û grûben sîyasî va girêdayî ne. Sazîyên ku tenê xizmeta zimên û kultura kurdî dikin û serbixwe ne tunin yan ji pir kêm in. Loma sazîyên zimên û kultur ên serbixwe ku tê da her kurdek bikane xwe bibîne û bi şûxile şert in.

Talîyeke me yê dine mezin jî heye. Kurd, bi çi awayî sazîya çêdikin? Nimûn; birek kurd tên cem hev, deng dikin, qerar didin û sazîyê xwe çêdikin. Pir cara, ew qerara xwe bi tirkî didin û danûstandinê bi tirkî dikin. Her tişt bi tirkî ye, tenê armanca xwe kurdî ye.



Ji civîna sazkirina Komela Ziman

www.arsivakurd.org



Dengbêj Şivan û hîmdarên Komela Ziman

Hevalno !

Wext hatiye ku em êdin xatirê xwe ji vî awayî sazî çêkirinê bixwazin. Lowma me haziriyên xwe boyî sazkirina *Komela Ziman û Kultura Kurdên Anatolîya Navîn* gîştik bi kurdî kirin. Em pê vê pir şa ne.

Tiştên dinê ku em pê şabibin jî hene.

Van dehe salên çûyî da, Kurdên Anatolîyê heşare xwe bûne. Wana dest pê lêxwegerînê kirine. Ew kovaran derdixin, komelan çê dikin. Di nav wana da dînamîzmek çê bûye û guman heye ku jê fêydaya bigehê ziman û kultura kurdî li Anatolîyê.

Berî her tiştî ziman nîşana nasnameya me û cûdatîya me ye. Her zimanek, her cudatîyeke kulturî parek e di medenîyata dînê da û jêhatî ew e ku em bi zimanê kurdî binivîsin, bixwînin û eserên xweş û bi kêr bînin meydanê.

Dermanê derd û kulên zimanê kurdî, ziman bixwe ye. Çareya talîyên zimanê me, di nivîsandin û xwendina wî da ye. Kilamek, çîrokek an romanek bi kurdî nivîsandin û xwendin bedele hezar şîret, gotin û lomeyên bi tirkî di heqê zimanê kurdî da ye.

Neyar û nexwazên zimanê kurdî pir in. Hen ji wana eşkere û li ber çavan e. Lê hen jî hene, ewê veşartî ne û ji me va xaynakin. Navê wana bîrbûn û wendabûn in. Ew mîna gurê har ketine nav ziman û kultura kurdî, wana qir dikin.

Li ser me ferz e, ku em li hember bîrbûn û wendabûna ziman û kultura kurdî derkevin. Va ji tenê bi rêya nivîsandin û xwendina bi kurdi dibe.

Berxwedar bin, boyî guhdarkirina we !

Nuh Ateş
03-04.11.2001 Köln

www.arsivakurdi.org

Mesejek ji bo:

Komcivîna Sazkirina Komela Ziman û Kultura Kurdên li Anatolîya Navîn li Almanyê

Hevalên hêja û mêvanên bi rûmet!

Îro, min jî, ji dil pir dixwest, di rojek veng muhîm û dîrokî de, bi we re bûma. Lê, li ber hinek karên min yên şexsî, mixabin nikaribûm werim. Hêvî dikim, heval û mêvan dê vê rewşa min, li min bibexşînin. Lê, ez bi dil û fikrê xwe, bi we ra me.

Îro, hûn li wir, ji bo karê kulturî, di dîroka Kurdên Anatoliya Navîn de, biryarên dîrokî bigrin.

Di parastin û pêşxistina ziman, kultur û folklora milletê me de, ew roj dê ciyekî xwe yê dîrokî û giring bigrê.

Ji ber vê yekê jî divê; ji bo kar û programa salane, biryarên realist û berbiçav bên stendin. Hevalên xwedî "kompentens" bi rastî ji dil û can ku ji destê wan de kar tê, divê bên hilbijartin.

Hevalno! ji bo gotina jor, bila tu kes li xwe tiştekî negre. Baweriya min bi we heye ku hûn dê biryar û hevalên jêhatî hilbijêrin. Lê, disan jî ez dixwezim bi bîra we bînim; piraniyên me bi salan, li welatên Ewropa, di komele û dezgehên kurdan de kar kirine û xwedî tecrûbeyên giranbiha nin. Em dizanin, pir caran ji ber hinek hesab û kitêbên biçûk ên siyasî, carcaran însanên ku ji destên wan kar nedihat, dihatin hilbijartin û encama wan hesabên biçûk jî, em hemû pê dizanin, ku piştî ewqes salan û xebatên giran disan jî me wek millet, ti îmkanên berbiçav wernegirtin.

Karê ku me daye ber xwe, pir zelal û vekiriye. Em dê ji bo parastin û pêşxistina ziman, çand, folklor û dîroka xwe û herwiha li ser koçberiya milletê xwe kar bikin. Ji bo vê jî, kî li ku û di çi warî de jêhatîbe, divê wî karî bigre ser milê xwe.

Ew komele, ji bo vê armancê, dê îmkanên maddî û manevî peyda bike, ku ev kar û herwiha kovara me Bîrnebûn hîn bi rêkûpek û profesyonel derkeve.

Bi hêviya ku hûn dê di vê roja dîrokî de biryarên berbiçav bigrin, we giştkan silav dikim û hurmeta min ji bo we û biryarên kongrê heye.

Serkeftî bin!

Stockholm 03-11-2001
Ali Çiftçi

www.arsivakurdi.org



Hinek ji hîmdarên waqifê (Foto: George Kristiansen)

Waqifa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêde hat avakirin

Di 16/02-2002 de li bajarê Stockholmê Kurdên Anatoliya Navîn yên ji gund û derûdora bajarên Konya, Ankara Kirşehîrê bi komcîvînekê, Waqifek bi navê *Stiftelsen Kurdên Anatoliya Navîn* çêkirin. Ew waqif dê ji bo parastin û pêşxistina ziman û kultura kurdî hem aborî û hem jî manevî ji bo îmkanan peyda bike, hatiye avakirin. Navenda waqifê li bajarê Stockholmê ye.

Civînên yek (2001-12-25) û duduya (2002-01-05) li ser pêwîstiya Waqifê û destûrê hatibûn kirin. Sedema civîna sisîyan ew bû ku hîn pir însan tevê bibin.

Civîna sisîyan ya ji bo avakirina Waqifa Kurdên Anatoliya Navîn li lokala Weşanxana Apecê, li Spånga yê çêbû.


www.arsivakurdi.org

Beşdarên civîna sisîyan ev kesan bûn:

Ali Çiftçi, Seyfi Doğan, Mecit Çifçi, Ali Coşar, Harun Coşar, Haci Baysal, Mahmut Baran, Hamit Atmaca, Haci Çelik, Metin Güler, Yusuf Güler, Mahmut Arikan, Reşit Karakaya, Ömer Sarıhan, Ibrahim Yıldırım

Rojeva civîna sazkirina waqifê weng hat tespît kirin:
1. Li ser destûrê dengkirin
2. Armanca Waqifê
3. Avakirina Waqifê

Maddên destûrê yek bi yek hatin xwandin û li ser munaqaşa bûn. Derveyî armanca waqifê, maddeyên din gîştik hatin qebûl kirin (pejirandin).
Li ser armanca waqifê dûr û dirêj hat deng kirin. Ji redaksiyona kovara Bîrnebûnê Seyfî û Ali, ji bo çi waqifek pêwist e, deng kirin.
Her kesekî ditina xwe li ser armanca waqifê diyar kir û armanca waqifê hat qebûl kirin.




Serokê waqifê Mahmut Baran ji gundê Hecîlera ye. Li Swêdê ekonomi û hukuk xwendiye û niha di buroyeka advokantan de wek jurist kar dike.



Ji civîna sazkirina waqifê

(Foto: George Kristiansen)

www.civakurdi.org



Ji civîna sazkirina waqfê *(Foto: George Kristiansen)*

Armancên Waqifê:

1- Waqif dê li gor îmkanên xwe kar bike.
2. Waqif dê maddî û manewî piştgiriya Bîrnebûnê bike.
3. Waqif dê ji bo parastina û pêşxistina zimanê kurdî îmkanan peyda bike.
4. Ji bo kultura Kurdên Anatoliya Navîn were naskirin û belavkirin, kar bike.

Roja resmî avakirina waqifê 16 şubatê 2002 hat qebûl kirin.

Ew kesena ji bo komita karger hatin hilbijartin:
Asîl: Mahmut Baran, Ali Çiftçi, Reşit Karakuyu, Seyfî Doğan, Ali Coşar
Cîgir: Ibrahim Yildirim, Ömer Sarihan.

Serokê *Waqifa Kurdên Anatoliya Navîn* ya li Swêdê Mahmut Baran hat hilbijartin.

www.arsivakurdi.org

Şîn û Mirin

M.Ş. Dağ

Mirinê, bi navê xwe yî sar, her civatek bi çaxan bê çare hîştiye. Her civatekê, li hember mirinê, ji bo bêçare bûyina wê reaksîyon nimandine. Her civatek xwedîyê çand û kultirekê ye.

Şîn jî, perçekî çanda civatê ye. Civata Kurdên Anatolîya Navîn jî, li hember mirinê reaksîyonên xwe, li gor erf û edetên xwe bi ci tîne. Li ba Kurdên Anatolîya Navîn şîn, li hember mirinê wek serhildanekê ye. Lê serhildanek bêhêvî.

Mirin û şîn;

Di erf û edetên kurdan de bi serê xwe, cihekî mezin digire. Li miriniyekê; rawûn û rûniştin, ber gundê mîvana çûyîn, ger azcîyên ji gund ger jî azciyên yad: mîvan kirin, xizmetê wan kirin û verêkirin li gor erf û edeta ye. Kê, ew erf û edetana neanîn şûnê, yê li civatê were rexne kirin û pir bi eyib e.

Meyît Heynan:


Dema ku gundîya xebera mirinê bîstin; tev li ber mala miri berhev diwin. Mêr haziriya meyît dikin. Tirba (gor) miri bi kolandi didin. Ava miri didin ser êr. Xoce yê here camîyê (mizgeft) selayê bixwîne. Jinê, şînê bikin. Eger miri li gund nemiri be (li bajêr, Ewrûpa) gundî û meriyên miriyên miri bi cenazê ra tên gund. Si-çel salî berê, miri ku jin be; jinên gund, mêr be, mêrên gund, Ber, gelt an jî xela spîbelek di dora xwe re çerx dikirin û xelqek çê dikirin. Di nava wê xelqê de melleyê gund an jî jinekê meyît dişuşt û awdesta wî (wê) didayê. Niha gundên ku bûyine belediye, erebeyên xwe yên meyît şuştinê hene.

Dûra mêrên gund meyît didin ser millên xwe, dibin ser kevirê musala û nimê dikin. Ji nimîyê şûnda dibin goristanê, meyît dikin gorê. Siftê merîyên xwe yên nêzîk xwelîyê davên ser. Dure Melle telqînekê dixwîne û gundî vedigerin mala miri. Dema cemaat tê ber malê; Melle quranekê li der dixwîne û cemaatê daweta hundir dike. Mêrên malê, siftê herin cem jina, şîna xwe bikin. Dûra vedigerin oda mêran. Melleyê li hundir jî quranekê dixwîne û bi gundîya re tev serxwaşîyê didin yên dilkeştiya (eznî) û li ber wana cixarê digerînin. Melle û mezinên gund malbata dilkeştî awnî (teselî) dikin, ku êşa wana sivik bibe.

Oda mêran û azcî

Di şînan de mêr li ciyekî, jin jî li ciyekî rûdinin û azcîyên xwe derbas dikin. Jin şîna miriya dikin. Li şînekê rawûn û rûniştin û mêvankirin qaîden xwe hene. Ew qaîdana li cem mêra û jina ne mîna hevûdu ne. Wextak mêvan tên; merîyên malê tev radibin ser

www.arsivakurd.org



Dema şûştina miriyan

xwe û mêvanên xwe bi ci dikin. Dûra melleyê quranê bixwîne û cemeeta fatîheke. Cemeeta rabe ser xwe li pê, xêrhatinê li mêvana dikin. Mala şînê cixarê li ber mêvana digerînin û çayê belav dikin. Mêvanên ku tên; (ji gundên dor-alî) eger meriyê xwe yê nêzik bin, bi xwe re ji mala dilkeşti re pez, berx, çay/şekir û cixara tînin. Gundî jî, yek bi yek cixarê li cemaatê belav dikin û yek pakêta jî, ji bo mêvana davên teqê.

30-40 salî berê, mîna niha rê û erebe tunewûn. Ji bo wê li miriniyekê mêvanên yad çend roka li mala şînê dîwûn mêvan. Niha ne weng e, piranîyên mêvana du-sê seeta rûdinin û xatirê xwe dixwazin û radibin terin. Niha carna, ji gundên yad, ji meriyên miri sê-çar mêr an jî jin li gund du-sê roja dimên.

Li şîna, mezinekî gundê xwe bi pêşiyê de, ku mêvana çing bi mêvan kine, kî nanê wana bike, ewê qererê bide. Gundîyên ji bo nanê mêvana di dorê kevin. Her rokê, du-sê malên cîran yên nanê bikin. Ji bo ku pir qeramî nedin ser mala dilkeştî.

Dema ku mêvan radibin jî, quran tê xwendinê. Dûra yên xatirê xwe bixwezin. Merîyekî malê yê xeberê bi jina de, ku ew amade bin. Jin jî yên, şîna xwe bikin û xatirê xwe bixwazin. Mêrên malê û çend gundî, di ber mêvana bi derkevin û li ber malê yek bi yek dikevin dorê û mêvana bi rê dikin. Mêrên malê, li dema rêkirinê xatirê xwe ji jinên mêvan û mêrên mêvan jî, ji jinên malê xatirê xwe û serxwaşîyê dixwazin.

Cîyê jinan û şîn

Ji bo bergundê mêvanan, çend xort ji mala şînê li derva dipên. Dema mêvan hatin, ev xeber didin. Jinên yad hatin, jinên malê kincên miri (ceket, sal, îşlig) di dest xwe kin û wana li hewa helavin û şîna xwe dikin. Bi kilamên xwe bergunde wana diherin. Mêr, destê xwe di sûyên hevûdu re dibin û digirîn. Jin, por û biskên xwe, rûyên xwe diriçûkînin, bi mista li xwe dixin û digirîn.

www.arsivakurdi.org

Giranîya şînê, li ser milên jina ye. Dema jinên azcî hatin ew jî diherin cîyê jinan. Yek bi yek dikevin hemêza jinên malê. Ji jinên yad hena, kesekî xwe miriyê di kilama xwe de navê wî (wê) jî derbas dikin, ew ji erf û edeta ye.

Jinên hatinî şînê; li mirina miriyên wê, kî neçûye azcî nakevê hemiza wê. Ji bo ku sîvahatina xwe nîşan bide.

Şîn li gora miri, (xort-ciwan an jî kal û pîr) bi şevat dibe. Şîna xort û ciwanan, giran û bi şevat in. Jinên malê, li gora wê êş û şevatê, bi kilamên şîna êşa xwe tînin ziman. Carcaran li gora êş û şevata ku miri dayî malbatê, mêr jî kilamên şîna dibên. Kilamên şîna di çanda Anatolîya Navîn de cihekî mezin digirin.

Şînên Kurdên Anatolîya Navîn jî, wek daweta, erf û edetên xwe kulturek mezin e. Kilamên şîna hetanî huro bi edebiyata devkî hatine parastin. Însanên me, hîn jî guh didin ser wana û bi wan kilamên şîna, dilê xwe zîz dikin. Li Anatolîyê, pir jinên şare yê bi nav û deng hene. Wek, ji Xelikên Gölyaziyê Gula Hecî Tîtê, ji Omera Sûs, ji Kirkpinarê Eş Mavî, ji Xelikên Qerecdaxê Zêva Çûç û hwd. Ez dixwazim ji wan kilamên şîna çend mînaka bidim we.

Ji Xelikên Qerecdaxê Eşê Rostê, keçika xwe ya bi dergîsti, li ber tevnê, kêr tê kew kiriye. Junîyê we bi birîn kiriyê û bi vê birînê keça xwe mir şû va digot:

Vana cîyana yê bi lêmiş tin
Qirik û qertel lê daniş tin
Gunda acûya ji min bigirin
Meyîtê kêçikê bi dê şuştin.

Ji Kirkpinarê Eş Mavîyê, ku keçika xwe ya 18 salî bi derdekî bê çare mir, gotiye:

Li lîvanê, Zêvo li lîvanê
Hewêsa dilê min de mayî
Min Zêvik nedî bi şar û kitanê
Feleka ku mala xwe şewitî
Çelî zemerîyê kirina xwe nizanê.

Dîsa ji Xelikên Qerecdaxê, ku mêrê xwe li orta dawetê dildawestî û mir, Zêva Çûç êşa dilê xwe weng anîyê ziman:

Dilê min deşta Heranê
Xopan bimê birûska li rû baranê
Ji maleke bi danzde meriya
Bavê Memikê li horta dolê da nîşanê.

Ji Xelikên Gölyaziyê Gula Hecî Tîtê jî, dema ku birayê xwe bi ber bîçerê ket û ew wenda kir li şîna wî, ev kilama digot:

Bîçerciya bîçerê xwe kişandin
Dati ya ku serê Xelî Besê xwarî
Termî ya kekî min zevî heşandin
Bênê kekê min kirin mazot
Li bîçerê qelivandin...

Li şîn û mirinê erf û edet

Min got ku di jîyana Kurdên Anatolîya Navîn de şîn, çandeke mezin û bi serê xwe ye. Wê çandê jî, bi serê xwe erf û edetên xwe hene.

Berê, mêra, baw û birayên miri, bi ser mirinîyê de riyê xwe qe kur ne dikirin. Niha heftekî dudiya kur nakin. Deh û banzdeh roja şû va şîn belav bû; meriyêkî gund ê here berber wûne, serê wana kurkirin bide.

www.kirsivakurdi.org



Dema mêvan tên serxwaşiyê

Berê jina; kincên xwe bervajo lixwe dikirin. Balîf, xalî, mînder bervajo radixistin, nênik li dîver ters bi dar da dikirin. Reş girê didan. Niha; reşa xwe girê didin. 2-3 meha guh nadin ser radîyoyê û televîzyon temaşa nakin.

Mêr jî, jin jî 20-30 rokî destê xwe li ber xwe girêdayî digerin.

Mala miri li dol û daweta, li şenayîya nêne dîyinê. Jinên malê, demeke dirêj xwe naxemilînin û dêsten xwe hinne nakin.

Mêvanên yad, bê nan bernadin. Ku mêvana nan nexwar û çûn, ê bên "*nanê me di qavê de cihiştîn*" û ên sîva werin.

Li nav gund, ji bo yên dilşikêstîne, herkesekê jê re hurmetîyê bike. Li cem wana yarenî û heneka nakin.

Meriyên ji bo serxwaşîyê hatine malê, çiqas pir win, wiqas rûmet e.

Xaltî, xwang, met hwd. Merîyên miri, çar pênç roja li mala miri dimên.

Li dol û dawetekê; cîran dê herên misadeya xwe ji mala şînê bixwazin.

Salekê-dudiya, li her îdekê gundîyên herin mala şînê, li mala wana îda xwe bikin. Jin jî, yên dîsa şîna xwe bikin.

Berê roka çelî nana dêv dikirin. Gundî û merîyên xwe yên li gunden cîran dawet dikirin, nan didane wana. Niha di 7-10 roja de be jî, nên didin xwarin.

Di wê çand û kulturê de metelokên Kurdan jî hene; wek, "Dîna nas bike li şîna", "*Mêrê dîn li hinga (şer), jina dîn li şîna*" hwd.

www.arsivakurd.org

Kilamên Şîna

Mem

Hespe Memî min sisê ne
Mîna motirê li ser sûsê ne
Koma min qurbane hevêsa dil da mayî
Didanê zêrinî dêv da debrûsêne.

Malê yaylê li serê gir in
Ne bar dikin ne diêwirin
Garê min bi hewêsekê
Ji bûka xwe re kirin
Xelkê jêkirin re yê xwe bi şûnê va kirin.

Xestexana Gêçioranê bişevite li sinor e
Toxtorê bi ser Memî minî kibar ra
Dawestîyane qor bi qore
Min Memê xwe bire bîst-pênc toxtora
Gotin defer nêdîyinê li derdê
Vî lawikî ser bi pore.

Anqere bişevite ji me wêda
Bi ber xestexana ketim pêda pêda
Min Memê xwe yî kibar nedî têda
Min ezraîlê Memî xwe bidîya
Min canê xwe yê ji berva pêda

Dilê min germa havînê
Memê min çîçeka li devê înê
Gunda bûka min ji Memê xwe ra
Bi hevesekê didan zêr kirî
Ê çayê siwe ji xelkê ra dikelînê.
Ro ji bana narin bana
Lawikê bi dergîstî osan bûyê

www.arsivakurdi.org

Ji toxtir û ji dermana
Bûka me huro li mala me raket
Min birbangê bi şûva bire xwedana
Telê bi tenê yî li eskerê
Xermanê xwe yê mane li şûna xermana
Kekê minî dipêyê derîya cîrana
Çi kibarî çi narîne
Henî yê kiriyê balîfê helnîne
Min go dergîsta te yê werê ser te
Go ezî zayifim ma min bi vî halî nevîne
Fato tu çuyî hennê xwe mexemilîne
Zavî bûkê yî esabîyê naterqîne

Hespê Memî min timarkin
Nal û mîxê wana eyarken
Malê yaylê bardikina yaylê
Bûkê min wûnîn malê Memî min
Vi male yaylê ra barin.

Şeve şeve Memik şeve
Derîyê xestaxana berve heve
Bûkê emê nifira li te bikinî
Emê bênî ba li teşî ya te nekeve.

Gêre gêre Memik gêre
Bejna Memî min şivek ji zêre
Bûkê çava xwe heyne li zavê xwe mêzke
Metikê min qurban orxana ku
Vê rû mayî li pî sêre
Te çima negot were
Canê xwe bi canê min biguhêre.

Neîm û Eş
(Ji gundê Xelika)

www.asiyakurdi.org

Kevirê Mezela

Kevirê Mezela reşe girin
Ne bar tewin ne têwirin
Nanê ku me ji dolê ra kirî
Pê azcî yê te verê kirin.

Vana çiyana çiya sêvandin
Êmilkê bavî Memî mine gurleh dû gerandin
Zeyî yê me ê ku hatine dolê
Me bi kincê vajo verê kirin
Korta bergîra bişevite bi tûn ave

Gêçût nadê bi tûn delave
Hatin şûna xanîya belav kirin
Bavê Memikê tune li nave
Min go ê gîa girêde bi benekî xafe.

Dolcî ya rave li dole xîne
Ma Zêva Mêmûd û Fata Hesê
Govendê bikişîne
Rehmê Îbrêma sêrê bûkê helîne
Hevê Memo û Zexê Sêdile
Nanê dolê bikelîne.

Dilê min germa havînê
Dide qonce reçbere Kanîya Osmên dikelînê
Reşê Hemê yî bûkê viderxînê
Qamyonê berê li tirba te biqelivîne.

Lewî banî lewî banî
Min go te çima pê nizanî
Bi sê jina bûkekê wûnî
Çima te paşî nanî.

Dilê min deşta Heranê
Xopan bimê brûska li rû baranê
Ji maleke bi danzde meriya
Bavê Memikê li horta dolê da nîşanê.
Qerecdax bişevite bi dare
Min wenda kiriyê bavê Memîkê yî kibare
Eza herim wê korocaxê temekim
Ma vi bavê Memîkê ra bê hîn bêraqa me yê li dare.

Zêva Çûç
(Ji gundê Xelika)

www.arsivakurdi.org

Lawî Lawî

Lawî lawî Îsmet Lawî
Qurbana elbîsa hêşin qirata mavî
Tu mualîmê Qozalîyê yî
Çima di ber telebê xwe da mayî

Bawile Îsmetî min didu ne
Ji kitaw û romana tiji ne
Nuhê go etê bawilê Îsmet bi min de
Min go bi qurşînê bermede canê mine
Ê li bin kulînê toz girtine.

Li şê tê Îsmetê min li şê tê
Vapûrê li Stenbûlê bi hawar dêtê
Telebe yê lisê sporê dikine
Min tu yê mîna telebekekî xwe nadîn li wê nîşêtê.

Zêva Çûç
(Ji Gundê Xelika)

www.arsivakurdi.org

Kilama Husikê

Xwange bira veng navin
Gulî yê xwe yek biskê qetîya win
Reşê xwe ya girêdayî
Zirave yê xwe ê di billûrada win.

Dilê min têlê tembûrê
Şofera barê xwe barkirin çûne Semûlê
Wexta ku birayê min mîna ê te bi kinca va gêrbûn
Omera û Bîrtalikê kilamê min kirine billûrê.
Hecî ya dilê minî li yane
Li te mij-avî, li min dûmane
Hewa Memo eva berê bi derê Heckuş ket
Got: kê cara jin bi xatira dane.

Biçercîya bîçerê kişandin
Dati ya ku serê Xelî Besê xwarî
Termî ya kekî min zevi hesandin
Bênê kekî min kirin mazot
Li bîçerê qelivandin.

Dilê min tine tine
Ne polate ne hesine
Bra yê min sewa dewara dinê
Ji Tirkîyê derketine
Ezê ji ê miri pirtir
Bîra ê xwaş dikime.

Dilê min vêkesê
Bûyê cawê ber meqesê
Çûm dîyarê Qonyê ketim
Hêlek mala Hecî Tîtê
Hêlek mala Xelî Besê

Hecîya siwekê li siwê zû tê
Gîyayî qereca yî li rû tê
Mala Balekûra ez qewitandim
Go here bera xwe bera malê Tîtê.

Dêra ku ez lê ne tu dêre
Ji qeytanê berjêr kire
Bi dîyarê Qerecdaxa şevitî ketim
Min go Hesikî miriyê Huskê xêre.

Gulê Hecî Tîtê
(Ji gundê Omê)

www.arsivakurdi.org

Li ser jinan çend gotinên bav û kalan[1]

Bila jin be, jina mêran be.
Bila jina çê be, bila di nav ordiya tirk de be.
Jin bedewa emr e.
Jin çûn hewaran, mêr ketin kewaran.
Jin diçe xwînê, xwîn safî dibe.
Jin dîwarê hundir e, mêr dîwarê der e.
Jin gol e, mêr çem e.
Jin heye ji sed mêrî çêtir e.
Jin heye mirov dike wezîr, jin heye mirov dike rezîl.
Jin him gula çavan e û him jî kula çavan e.
Jin kaniya jînê ye.
Jin li pişta mêr şûrê dudev e.
Jin rewşa malan e.
Jin sê ne: jina ji dil, jina bi kul û ya dermanê dil.
Jin û mêr dergehvanên malê ne.
Jin û mêr heval in.
Jin û mêr tevr û bêr.
Jin dibêjin: cil zêr e û xwarin jehra mêr e.
Jina baş birayê mêrê xwe ye.
Jina baş mêrê nebaş baş dike.
Jina çê hêjayê dinê.
Jina ku zû radizê, mêrê xwe kal dike.
Jina malê binyata malê ye.
Jina qenc bihuşt (cenet) e.
Jina rind belayê serê gund.
Jiyan bê jin nabe.
Ne jina xewar û ne mêrê tiral.
Se ku se ye naçe jinan.
Şêr, şêr e, çi jin e, çi mêr e.

[1]Ji pirtûka Amed Tigrîs a *Gotinên Pêşiyan* (Stockholm- 2001).

Komela Çanda Kurd ya Gordoxlî li Swêdê:

"Êdî ev dera welatê me ye... Em ê li vir bijîn û li vir jî bimrin"



Serokê komelê yê fexrî Yusuf Güler
(Foto: George Kristiansen)

Me vê dawiyê bîhist ku komeleke bi navê *Komela Çanda Kurd ya Gordoxlî li Swêdê* (Gordoglu Kurdisk Kultur Föreningen) saz bûye. Gordoxlî (Gundê Omê, Zincirlikuyu) navê gundekî Kurdên Anatoliya Navîn e û gelek ji vî gundî îro li Swêdê dijîn. Kovara Bîrnebûn sazbûna vê komelê wek gavek gelek bi feyde dibîne. Em dixwazin di vê hejmara kovara Bîrnebûnê de hinekî vê komela balkêş bidin nasandin. Belkî ev cara pêşîn e ku gundekî ji Anatoliya Navîn li Swêdê komela gundê xwe saz kiriye.

Gundê Gordoxlî di sala1915'an de bûye gund û 1967'an de jî bûye belediye. Çar zozanên xwe hene. Eşîra wan sêfkî ye. Navê vî gundî yê berê *Kürtoğlu* bûye. Ji gora hin dîtinan xelkê vî gundî ji aliyê Elbîstanê hatine.

Di roja 12/1. 2002'an de li Buroya Bîrnebûnê me bi du berpirsiyarên Komela Gundê Gordoxlî re; Ismet Aktaş û Yusuf Güler re hevpeyvînek wek sohbetekê pêk anî. Li jêr em beşeke vê sohbetê pêşkêşî xwendevanên xwe dikin (*Bîrnebûn*).

- Komela we çî wextî saz bû?

- Komela me nêzîkî berî salekê saz bû. Di roja 24/12. 2000'an de kongra xwe ya pêşîn pêk anî.

- Çiqas endamê komela we hene?

- Nêzîkî 200 endamê me hene. Îro qasî 600 kes ji vî kundî li Swêdê dijîn.

- Lokaleke we heye?

- Naxêr, me ecer vekir, hin problemên me yên ekonomîk hene, divê em van çareser bikin.

- Serokê komeleyê kiye?

- Serokê komela me Îsmet Aktaş e. Serokê me yê fexrî Yusuf Güler e.

- Armanca sazkirina vê komela we çi bû?

- Êdî welatê me ev dera ye. Li vir problemên me hene. Zarok li vir mezin dibin, kal-pîr dibin, nexwaşiyên wan hene, mirov dimrin û divê goristanên (qebrîstan) wan hebin. Dewat, dîlan û şahiyên sinetê hene. Li welatê endustî de de hezar problem hene. Li vir jîyan gelek zehmet e. Mirov divê hevdu bibînin, bên - herin, rojên şîn û şahiyê de li bal hevdu bin. Li gundê me her çêşîd mirov hene, ev yeka normal e. Baweriyên cihê hene. Eva dewlemendîk e. Problema kurmancan sifte di vir de belavbûna kurdan e. Armanca me ew e ku em mirovên xwe bînin ba hev.

www.arsiv.org



Hinek ji endamên Komela Çanda Kurd ya Gordoxlî.

- Ji bo ziman we armancek daye ber çavan?

- Belê. Li Swêdê zarok çi diwazin, dewlet alikariya wan dike. Em jî diwazin hin tiştan bikin.

- Wekî din?

- Armanca me tenê ne hînkirina zimanê kurdî ye, qasî ziman, şaxsiyet jî muhim e.

- Dixwazî bêjî ku kultura kurdî jî divê mirov hînî zarokan bike?

- Belê, rast e.

- Armanca we ya here mezin çi ye?

- Em dixwazin pêşerojê de hin tiştan bikin. Em naxwazin Gordoxlî li vir bibe cimaeteke girtî û bibe kolonîkê. Em dixwazin mirovên Gordoxliyê û mirovên Anadoliya Navîn yên mayîn hev nas bikin û bibin yek. Xelqê ji Anadoliyê hatine bi hevre bin. Me gavek avît, paşê belkî Omera, dusibe Celep jî komelên xwe saz bikin û paşê hêdî hêdî ev hemû komelan dikarin bibin yek.

- Kesên ku cara pêşîn ji vî gundî hatiye Swêdê kîne?

- Tevfik Bal, Mehmed Bal, Fikret Guler, Hamit Atmaca, Orhan Guler... Di salên 1974-1976 hatine Swêdê. Kesê ku cara pêşîn hatiye mirov dikare bêje ku Tevfîk Bal ku di sala 1974'an de koçî Swêdê kiriye.



Elif û Bîlal Bal ji gundê Omê ji bo seredana zarokên xwe hatibûn Swêdê.

www.arsivekurd.org



Ew resim di piknikeke ku ji aliyê komelê ve hatiye organizekirin, hatiye kişandin.

- Zêde li kîderê dijîn?

- Li taxên wek Vårbygård, Fittja, Norsborg...

- Mirovên ji vî gundî hatine zêdetir çi karan dikin?

- Di karên serwîs, restorang û texsitiyê de dixebitin.

- Dema dibêjin Gordoxlî çi tê bîra merîya?

- Dorberê me ji me re dibêjin: *"Gordoxlî, Moskova ye"*. Tirk, kurd ji me re wusan dibêjin. Gundekî sosyal e, ji guhartinan re vekiriye û xwendekarên wan zêde ne.

- Ev nava ji ku hatiye? Gelo ji tirkî hatiye: Kürt oğlu?

- Na, na!

- Pekî ji ku hatiye ev nava?

- Ji Gord tê. Ev navê qebîleke kurdan e. Angorî dîtinekê kesekî bi navê Omê Gordê, li vir îskan kiriye. Navê gund bûye gundê Omê Gordê. Niha jî ji vî gundî re *Gundê Omê* dibêjin. Tirka paşê navê gund guhartine, xistine Zincirlikuyu. Gel ev yeka protesto ki riye, navê berê heta niha bi kar aniye. Em navê Zincirlikuyu qebûl nakin. Eşîra ku li vî gundî dijî, jê re dibêjin, Reşiya. Li dijî dewleta Osmanî derketiye. Tu car bac (vergî) nedaye dewletê. Ji berê de, eşîreke ku bindestiyê qebûl nake, hatiye hesibîn. Eşîreke welatparêz e.

- Ji gundê we gelek kes derketine derva?

- Gelek çûne derva. Gund ji wan re piçûk hatiye. Gelek çûne nav bajarê Ankarê, Îstenbolê û çend welatên Ewrûpê... Ji sala 1990 vir de ya xwe hatin, ya jî zarokên wan hatin Gordoxliyê û ji xwe re xanî, mal li wir çêkirin. Mirovên me ji Ewrûpayê diçin tetîla xwe li Gordoxliyê derbas dikin. Ji Gordoxliyê gelek mirov li Ewrûpê rûniştine. Em ê li vir bijîn û li vir jî bimrin!

- Kesekî ji gundê Gordoxlî derketiye û îro navdar bûye, heye?

- Bîlal Ercan wek dengbêjekî gelek hatiye nasîn û Fîkret Guler di spora tekvandoyê de navdar e.

- Pir spas.

- Em jî spas dikin.

www.arsivakurdi.org

Şivan o dûajo

Şivan û dûajo
Zûke lawo pêz bajo
Birçiyo belengazo
Zik qaj qajo
Dûajo pirsî ev çi ye?
Şivan got "hevşan e"
Ji bo ku tu bizanbî
Bi êla me re dibên rewşane
Şîrê pez bi qîmete e.
Hebûna wî rûmet e
Sibê û êvarê vedixwin
Xilas nabe çi hîkmet e
Nanê şikeva û şîr
Mîna xwarina mîr
Dûajo xwekiriye tîr
Bala xwe dide mîya pîr
Xwarina me îro kereng e
Ber êvara dereng e
Dilê min û te bêdeng e
Ala me bi pir reng e
Şev şeveke tari ye
Lo dora hewşo baran bariye.
Gura ker xwariye.
Şivan û duajo pir qehiriye
Berbangeke havînê
Me pez rakir şevînê
Qet qewlê min û te lê dînê
Tu çima niha tê şeva înê
Li me selitî gur
Mîya guhpisk û hustu bi gulê bir
Dûajo te bi gotina min nekir
Me bezê mexel kira li dora gir
Ez şivan im nezanim
Dost û dijmin baş dizanim
Ne baha me, erzan im
Ji bo ez xizan im
Pezî te ye jçriya mala
Ceh genim kirine çalan
ji welatê bav û kalan
Em dûr ketine bi salan
Li ber pezê nêr e
Hebûna wî ji bo kêr e
Dêrak em lê netu dêr e
Em direvin ji ber bêr e
Têr û bizbên e
Kilavî li ser mila ye bi dêne
Me zor daye kene
Dijmin li me dike fen e.

M. Kizilkaya

Ga westiyan

Em xwedî mal û star
û bi erd û tapan bûn
bi dest û mistên xwe
li ser axa xwe bûn.

Rojek rojeke biharê bû
Ewrekî reş girte ser me
Tofanek li me rabû
Wekî tofan Nûh.

Me çranên xwe yên rengîn
Wek ereb, ermenî, faris û suryan
Li cîh hîşt û berê xwe da welatê Romê
Derdikete nav komê.

Me ji serê girekî ajote ser girekî
Kal û pîr, zar û zêç dimirin
Me şuna xwe hişt bes bi girekî
Axîna me bû li ser her mirîkî.

Roj, meh, sal derbas bûn
Di riya koçberiyê de
Me xwe avîte Çukurovayê.
Welatê gul û gulbend

www.arsivakurdi.org

Ga westiyan li ber çiyayên Torosê
Toros havînê mêş û moz
Li zivistanê berf û bahoz.

Tekîra xopan bi dar e
Di nav da dijî zîha û mar e
Xwe avitin meya kibar e.

Em gihîştin textepaya selçûkiya kevin
Çoleke dûz e.
Çiyayê Hesendaxê bi ser de xûz e.
Avek jê tê xwarê wek ava kûz e.

Her bira li ser girekî
Bû xwediyê gundekî
Yek bû bilikî
Yek jî celikî.

Sêvikanê li binê tekê
Ev rastiya me ye kekê
Me çi kiribû ji xelkê
Ava germ li e kirin bi elkê.

Çemê Têrka û Samsamê
Pismêm çav berda dotmamê
Sunca evîna dilê xwe
Revand bire Ergomê.

Xelikîn û zirikîn e
Û herdu jî bi derdîkî ne
Ji bo welatê kal û bavan
Bi sed salan e herikîne.

Canbegan û reşî
Di xewna kûr de lingên min terişîn
Bira şerê hev kirin
Kela bilind dihejî.

Ji şêxbizina Gundê Ozê
Me soz dabû Gozê
Em ê vegerin Kokozê
Ji bo pêkhatina dozê.

Çiyayê Qerejdaxê û Celîl
Ji me re ne hewce ye delîl
Em Kurdên Anadoliyê ne
Bi orf û edetên xwe wekî herîr.

M. Kizilkaya

Ji bo Dayka min !

Ax lê dayê, dayîka min,
Min dixwast ku tim li ba te bim
Rûyê te sipî, mîna stêrkê ewra
Li ber çawê te bim.

Çûk bûm çûk, mîna dergûşekê
Di hemeza pak kevim
Min bihêzîne, min bihêzîne
Bi çêreka û lorika min xevê ke

To buyne ûmrî xwe
Bi meya dil xezkirê te diskenim dayê!
Min dixwast ku ez tim kurik bim.
Sikinîn bida, dawêstîna dayê,
Ma ez mezin newim
Herek mezin tewim dilî xwe qilêr tikim.

Min digot nave daye min Gûlk e
Ji naw dayekê dûnê da gûlek e
Her le ku gulakê tewînim
Gûlka min têyê bîra min

Zülfo / Şayıplı

www.arsivakurdi.org

BIHAR

Pozê biharê bû
Hêstirkên berfê
Bi lez dihelîn
Çûçikan li ser darê maktebê yê bi tanê
Bi huner û bisebir hêlîn çêdikir
Qal û pîrên ku li berojan rûniştî
Behsa camêrî û jêhatîtîya dikirin
Gulîyên keçikên berzewac
Li ser kaniyê
Li ber roja taze
Wek birûskên biharê dibiriqîn
Kurik li ser axa biharê yê nerm
Ji tuneyê û yasaxa bê xeber
Bi keyfên dilên xwe bi kît dilîstin
Çi rind...

Axa biharê
Axeke bi dil bû
Ax mîna bûke ber gerdekê
Bi hecan bû
Xorten
Av li didanen dilîst
Ava wek hesinê hêlî
hedî hedî
Dev û lêvên wana
Mîna êzingên payîzî
Çîk bi çîk dişewitandin.

Ferîdûn

www.arsivakurdi.org

Alfabeya kurdî ya latînî

Hejmara tîpên alfabeya kurdî 31 in.

Tîpên girdek:
A B C Ç D E Ê F G H I Î J K L M N O P Q R S Ş T U Û V W X Y Z

Tîpên hûrdek:
a b c ç d e ê f g h i î j k l m n o p q r s ş t u û v w x y z

Heşt dengdêr in:
a e ê i î o u û

Bîstûsê dengdar in:
b c ç d f g h j k l m n p q r s ş t v w x y z

Di zimanê kurdî de 31 deng hene. Ji bo her dengekî jî, tîpek (herfek) heye. Bi tenê dengekî taybetî di zimanê kurdî de heye ku bi du tîpan derdikeve û bi kurdî, jê re ***pevdeng*** *û ewropî jî* ***diftong*** *dibêjin. Ew jî tîpên* ***Xw*** *ne. Dengê tîpa "**x**" bilind û xurt e û ya "**w**" jî nizim û zeyîf" e. Carnan dengê "w" weha kurt û zeyîf e ku mirov nabihîse û bi tenê dengê "x" dibîhîse. Loma jî di nivîsandina kurdî de herî bêtir çewtî di vî dengî de tên kirin.*

Çend nimûne:
Xwe, xweş, xwişk, xwelî, xwê, xwarin, vexwarin, vexwendin, serxwebûn, xwîn, Cigerxwîn, xweş, nexweş, nexweşxane, xweşmêr...

Ev dengê kurdî ku ji du tîpan derdikeve, di zaravayên kurdî de ne wek hevin. Di zaravayê kurmancî de jî li gor herêman tê guhartin. Soran, dimilî û li hinek deverên kurmancî jî bi tenê "tîpa "x" bi kar tînin. Lê di rastnivîsa kurmancî de pêwîst e, mirov "**xw**" binivîse.

A. Tîgrîs

www.nawakurd.org

ÛSİVÊ MİHECÎR

Nuh Ateş

Havîn û peyîzê li ber hev didan. Li gora çerxandina dewranê dora peyîzê wû. Di zêdebûna sarîyê ra beli wû, ku peyîza bi ser keve. Tîna peyîzê bi şev hîn şên tewû. Di sarbûna heyêm û gûharîna bîhn û bexan ra xay dikir, ku demsaleke nû bi ser gûndê G. da tê xwarê û ewa bêgûman wî têke bin hukumê xwe.

Havînê, mîna ordîyê ku di şer da bi bin ketiwe, xwe paş da dikişand û qor bi qor bar dikir teçû.

Êvarê tarî rind ketiwû herdê. Wê berê, bi lez kert û kort, qûl û qewer, qûnc û kendal zept kiriwûn. Li ziqaq û meydanên fereh hîn tavên ronîyê, di nav tarîyê da, li vir û li wê dilîstin, tebrûsîn.

Xizmetkarê Elî Axa, Ûsivê Mihê kar û şixûlên xwe xelas kiriwûn û bêdil berve nav gund teçû. Ew ê biçûya ber dukana Hecî Omer. Ew pir neteçû dukana gund. Wî xwe ji civîn û civatan dûr digirt.

Ji malbata wana ra digotin, „Mala Mihê Mihecîr". Hîn ku Ûsiv di qûnda–xê da wû, nêzka sî salî berê, ew ji hêla Erzurumê hatiwûn û li gundê G. ê li bakûra deşta Konîyê dikeve, bi cî bûwûn.

Wexta ku yekî ji Mihê sebeba hatina wan dipirsî, wî serî dikire ber xwe, digot: Kuçikên me bi yên mala pismamê me va dane hev. Li ser vê, gedeyên (zarok) her du malan jî beristin hevdu, şer kirin. Paşê, mezinên herdu hêlan ketin hev. Gîşt di herdê reş kevin! Me ji ber vê barkir, em hatin vira.

Çima ku ew ji paşê da hatiwûn, ji wana ra digotin mihecir. Malbata Mihê jî, mîna xelkê gund bi kurmancî deng dikir, lê bi zaravayekî din. Çend gotinên wana bi yên gund va hevdu nedigirt. Sewa vê, ji wana ra digotin, „ewê mihecîrkî deng dikine". Bi çavekî piçûk li wana mêz dikirin.

Malbata Mihê, xizan û bê erd wûn. Xelkê gund, yên bi heyi, fitr û zektê xwe tedane wan. Ew di derîyên xelkê da dişûxilîn. Dewara xwe bi şivanî û xizmetkarîya malên qelaw (dewlemend) dikirin. Mihê bîstûpênc sala şivanîya Elî Axa kiriwû Ro hat ew nexweş bû, mina ku tewên, kula xeraw lê hat.

Elî Axa yekî pir qelaw û pir jî temeh wû. Wî gunehê xwe bi ser kesî da bernedidan. Ew î bi kuruşeki bi dar da wû.

Wexta ku Mih nexwaş bû, çûwû ba Elî Axa ku îzînê bixwaze. Elî Axa oxir dayîye, lê hîn ku Mih li hêla malê wûye, di pêy merî şandine, çarixê

www.arsivakurdi.org

nigên wî jê kirine ew pêxas şandiye mal.

Ûsiv ji ber tuneyî û mihecîrtîyê nezewicîwû. Hemsalî û piçûkên wî zû va zewicîwûn, bûwûn xwedîyê zar û zêç. Salê wî di ser bîstûpênca ra wûn. Dayîka wî, Eyşanê digot: „Salên Ûsivî min yan bîstûpênc yan bîstûşeş yan jî bîstûheyşt in". Xelk bi vê gotina wê ya salnîşandanê dikenîya.

Ûsiv merîyekî bi qelfet û bê deng wû. Çavên wî ê mîna yên tota zer wûn. Gundîya tot û çavzerî neçê didîn. Xelkê Ûsiv mîna yekî fuqare, nezan û kûrfût didî. Hemsalî û piçûkên wî, hen diketin rû wî, pê qirf dikirin û dikenîyan, jê ra digotin: „Mihecîr, mihecîr, barê xwe mûj û hêjîr". Henan jî, ji ber ku kincê wî tijî pîne wûn, navê „çelpîne" pê va kiriwûn.

Li hember van nerindî û xerewîyan ew bêdeng dima; li ber wana heynedina. Wî berê xwe digûherî, xwe badida, mîna ku biweyî, mihecîrtîyê stû li wî xar kiriwû.

Ji ber sarîya êvara peyîzê, wî xwe nûre serhev kiriwû û mîna bavê xwe, hêlkî bi rê teçû. Ji bavê ra digotin. Hêlo jî. Ew li ser hêla rastê bi rê teçû. Merîyê şivan li ser hêlekê diherin. Ew henî, sîng û berên xwe nadin ber royê, ber ba û baranan; stûyê xwe dikşînin navbera herdu milên xwe û bi vî awayî xwe ji sarî û sermayê diparêzin.

Wexta ku ew nêziki xanîyeki kû xerewebûyî bû, xwe giran kir û dest avêtin ser duxinê. Wî xwast ku li ber dîwarê xêrewe avekê birijîne. Totek li hêla xêrewe li ser kevirekî, ku ji şêvereşe reştir wû, daniştîwû. Ew bi hatina Ûsiv hesîya û cilê firî û „uhu" dengek derxist, mîna ku biwê, „malxera". Li gora nistîyê, ku tot li ser xanîyekî danîşe, ew ê xerewe biwe. Lowma ku gundîyan tot didîn, ew tedana ber keviran. Xerewe mîna cîyên bi xof dihatin zanîn. Îna dikirin ku, di xerewan da cin û pêrî û ruhên mirîya dijîn.

Xanîyê xerewe ê Gayberî wû. Ku Gayberî mir şûva, jina wî Mahî bi kurikên xwe va bar kir çû gundê bavanan. Xanîyê wana î kevn bêxwedî ma û wext hat helweşi û bû xerewe.

Ûsiv, dest li ser duxinê li ber dîwarê xêrewe yê paşîyê dawestî. Di ser dîwêr ra berve hundirê xêrewe mêz kir û dengek bihîst. Jinekê di horta xêrewe da, berî berva hêla din li ser çokan rûniştîwû, „gijgij" av dirijand. Ji par ra canê wê yê sipî, mîna mermerî gewr, tebrûsî. Ûsiv gûh danan, mîna ku biwêyî, ewî dengê avrijandina jinikê li ser perdeya gûhê xwe qeyît bikê. Wî avrijandina xwe ji bîr kir, dest li ser duxinê man. Çavên zer geh gir geh jî piçûk dikirin. Tê bigota, ewî ku resmê paşîya jinikê, sewa fantazîya xwe, bikşîne, weqasî çav belkiriwûn. Ew veng bîstkê bêdeng ma. Xem û xeyal, heyecan, tirs û fedî di hundirê wî da li ba hev wûn, xwe li hev pêçawûn. Wexta ku jinik rawû ser nigan, hêtên wê yê tewatir ji Ûsiv va xay kirin. Her hêteke wê hemêza merîyekî tijî bikira.

Arê hesreta zewacê di bîra Ûsiv ra, mîna tîrekê, mîna siwarekî, bi lez derbas bû. Janekê kuta dilê wî.

Xanîyê Gayberî, yê ku wextekê malbatek tê da dijînî,şîn û şênayî, xêr û xîret hewûn; tê da zar û zêç dihatin dûnê, şa û mezin tewûn, niha bûwû

cî û warê totan, mar û mişkan, bûwû abdestxana mêr û jinan.

Hîto û hevalên wî ji Ûsiv ra xewer şandiwûn ku ew vê êvarê were ber dukana Hecî Omer û ew ê bi vî ra li ser tiştekî pir muhîm deng bikin. Ûsiv ji Hîto qet heznedikir. Hîto pir nerindî lê kiriwûn. Ew meriyekî hilebaz û şerxwaz wû. Fen û fut di dorê da pir wûn. Ûsiv dil tunewû ku here, lê newêrî û dizanî ku nehere, Hîto ji pîstê wî nawe. Ew giheştîwû hêla mala Husoyê Bêkir. Tê mala Huso da çireya bi şûşe vêdiket. Ronîya wê di pencerên malê yên caminî ra teda derva, pêş malê. Pencerê caminî û çirayên bi şûşe di çend malên qelaw da hewûn.

Ji mala Huso mêvan qet kêm nediwûn û sifra wî ji herdê ranatewû. Kulinga mala Huso bi heyî wû; kuçik û pisikên gund bi êvarê lê dicivîyan."Vuşşş", „vixxx", „îxxx", „xef-xef" dengê şerê kuçik û pisikan li ser bermayîyên mala Huso ên li ser kulingê dihat. Li ser hestîyekî req û rût û parînanekî kûfik û hîşk wana xwe gijê hev dikirin.

- Ha,Ûsiv, te rind kir ku tu hati, Hîto got û pê pîyê wî girt, serê xwe berve milê wî xar kir, mîna ku ji wî ra tiştekî bi dizikî biwê.

- Tu havalê me yî lo! Dilê me bi te dişewitê. Salê te, va ye, gihêştine ber sîyî, tu hîn nezewicîyî. Me qerar da, ku ji te ra rindîyekê bikin. Em ê soh bi şev Nazê ji te ra birevînin. Dera ku tu, di ber nîvê şevê werî ber goma kevn a Hesenê Fatê. Em ê li wê derê derîya te çav kin. Me bi Nazê ra jî deng kir, wê jî dil kir. Ew jî a bê paş gomê. Tuê destî wê bigrî pewî gundê M., mala xaltîya min. Min ji wana ra gotîye, wana hay jê heye. Ew ê li we xwedî derkevin, we nadin dest. Qe meraq meke!...

Ûsiv va qet ji Hîto nedipa. Cara siftê wû, ku Hîto ew bi navê wî yê esîl bi nav kir û negot, „Mihecîr" yan jî „Çelpîne". Ew bi vê şa bû, hendik ma bû ku Hîto hemêz ke û paç ke. Wî bi dîqet guh da ser gotinên Hîto. Heyecan û tirs di dilê wî da rabûn ser nigan. Ew kete şikê. Di dilê xwe da got: „Lê ku Hîto derewa dike û biwe ku ew fenekê li min bike!?

– Tu bi vî îşî xêrê ra teweyî çi, Ûsiv? Tuê biwêyî erê, lo? Hîto got û kete pîyê wî, ew berve dukanê kişand.

– De werin, em herin dukanê, sewa vî îşî, tenek şiranî bixwin, Hîto got.

Ûsiv bêdeng ma û bi rû wî ket berve dukanê çû. Dukana Hecî Omer di quncê gomê da wû. Di hêla gomê ya din da pêz û mangên wî hewûn.

Êvarî, wexta ku mişterîyê dukanê sohbet dikirin, pez û mange jî bi kuxîn û lêbijîna xwe, bi xîraxîra kayîna xwe, bi „meh" û „moh" nîya xwe teve sohbeta wan tewûn.

Hîto, lodek loqim û fistiq standin, bi Ûsiv û hevalên xwe va dixwarin. Birek meri li dukanê gihêştîwûn hev. Pîrê wana, xortên berzewac û nûzewicî bûn. Hopoyê Alê jî tevê wû. Hopo bi sala mezin wû. Axlar û dîndarên gund ew ne dihîştin nav civîn û civatên xwe. Hopo şorê xwe ji kesî ne dihêfşand; çi dihate ber dêv digot. Ew î şorhuste wû. Xorta ji dengkirina wî hez dikirin. Lowma, ew teçû cem xortan.

www.arsivakurdi.org

Di civîn û civatên hîngê da qal tim dihate ser mesele û serpêhatîyên dîn û îmanê.

Yeki got: „Doh êvarê ez çûm oda axlaran. Qala edeleta hezretî Omer dikirin. Bi çêrê wûn. Xoce got: „Di ser ya hezretî Omer ra, edelet hîn nehatîye rû dûnê. Rokê hezretî Omer bi koleyê xwe va bi kerê li rê wûne. Ew bi novê li kerê nihiştine. Kole sifte nexwaztîye, ku berve hezretî Omer li kerê ne, lê hezretî Omer israr kirîye gotîye, nawe, tuyê îla lênî..."

Yekî guhdar, ku mîna jina deng dikir û di dû her şorekê ra devê xwe bi dêst paqij dikir, got: „Wey bavo, de mêz ke, çi edeleteke bê emsal e!"

Hopo di bin simêla da keni got: „Weqasi bi edelete, çima koleyê xwe heye? Yekî ku koleyê xwe heye, li ba wi edelet tune!"

Hen guhdaran di bin çavan ra neçê li Hopo mêz kirin. Henan jî serî hêjandin, bi menaya ku şora Hopo tesdîq bikin.

Wê şevê qet xew nekete çavên Ûsiv. Dudilîyê xêr bi wî nekir. Wî jî hêlekê da bi Hîto îna nedikir, ji hêla din da jî, xwe bi xwe ra digot: „Lê ku gotinên wî rast in! Ku ez neherim, Naza ji destê min here. Birevînim tiştê neçê ê werin serîyê malbata me..." Hasilî ew ji nav tevlihevîyê dernetiket.

Ji zû va da wû, ku dilê wî li Nazê wû. Dê û bavê wî jî hay jê hewûn, lê newêrîn ku Nazê bixwazin. Digotin: „Em mihecîr in, Nazê nadin me, şorê me a li herdê keve!"

Sima Nazê li ber çavên wi, mîna xewnekê, dihat û teçû. Qasî deh sala ber vê, wî Nazê cara siftê dîyîbû. Li ser kanîya gimgimi, jinên mala Eli Axa herîya pez dişûştin. Ûsiv jî di ber destên wana da deçû dihat. Geh balîyên herîyê ji erebê dihêwrandin, geh herîya şûştî tebir li ser kevir û çiman redixist ku ew ziwa biwe.

Nazê jî tevê palîya hatiwû herî şûştinê. Wê kefîya xwe di bin rextê gulîyan ra li paş girêdawû. Binguhên wê yên sipî û rûçikên henarkî tebrûsîn. Wê derdawên xwe berjor helmaştiwûn; çipên wê yên tazî derketiwûn meydanê. Pêsîrên wê yên nûgihêştî û piçûk di bin îşlig da, mîna herdê ku ji ber kuvankê werimîyê, serî belkiriwûn. Xwî nok bi nok li henîyê ketiwû.

Ûsiv çav belkiriwûn li Nazê sêr dikir. Nazê herî ji wî xwast. Wexta ku wî herî dirêjî Nazo kir, çavên wana li hev ketin. Ûsiv li çavên wê yê gir û belek mêz kir, mîna ku biweyî tîrek di dilê wî ra çû xwarê. Juni di binda sist bûn. Pêlên dilê wî, mîna yên deyakî pêlxof, li ser hev diavêtin û dikutan singê wî. Ar û alafek li nav can û ruhê wî belav bû. Dest û nigên wî li hev piçikîn. Wî xwe şaş kir, ku çi bike.

Zêwa jina Eli Axa bi ser herî şuştinê ra dawesti bû. Mîna serdarê ordîyeki, wê bang kir got: „Ûsiv herîyê wûne!" Ûsiv bi dengê Zêwê heşare xwe bû. Nazê rû tirş kir, herî ji destê Ûsiv rakişand, mîna ku biwê, „wêy vî xêr e, xwelî vi serî we!"

Bi nîvê şevê, Ûsiv gihêşte paş gomê. Hîto û hevalên xwe di ber wî hatiwûn wê derê. Tenkî ji wana firk, Nazê dawestîwû. Hito got: „Ûsiv, tu mayî derengi, de zû ke. Aha Nazê, de di dêst ra bigre peve."

www.arsivakurd.org

Dilê Ûsiv gurpegurp wû. Ew nêzikî Nazê bû got: „Ka destî xwe, ka destê xwe...“ Wî bi destî Nazê girt û ew berve xwe kişand, tev hev bezîyan der gund.

Ji gund êpî vi dûr ketin. Nazê bi henîşka xwe di tenişta Ûsiv kuta got, „Daweste, ez avekê birijînim!“

Gavekê ji Ûsiv dûr, Nazê bi pê av rijand. Ne avrijandina jina wû; mîna mêra av dirijand. Ûsiv lê kete şikê. Nêzikî bû, bi hêrs got, „Tu kî yî lawo?“

Ez, ez, ez im, Osê dîn im! Wî zanî ku Ûsiv te wî anî derê.

– Ûsiv, qurbanê te me, ketime bextê te, li min mexe. Sûcê min tune, Hîto ez mecbûr kirim, got: „Tuê îla têkevî asima Nazê û bi Ûsiv ra birevî. Ku min bi a wî nekira, wî ê li min xista, tu jî pê dizanî, ezê bikuştama!“ Wexta ku mîza wî hat, wî ji bîr kir, ku ewî di asima Nazê da ye.

Ûsiv nezanî ku ji hêrsa ra çi bike. Destê wî yê raste berjor helat, „şîppp“ bi şelmaqê li bingûhê Osê yê çepê xist. Fişnîyek vi ser Osê ket. Wî bazda di nav şevreşê da com bû.

– „De here maga yî ji kerawo!“ Ûsiv di pêy wî got. Cara yeka wû, ku Ûsiv yekî gund şelmaq dikir. Bi vê, mîna ku biweyî, wî êdin qalikê mihecîrtîyê ji ser xwe avêt.

Hîto, him li Ûsiv him jî li Osê fen kiriwû. Ew, bi her duyan kenîwû. Wî bi nîv kîlo loqim Oso razî kiriwû ku ew di sima Nazê keve. Li gora qewlê wan, ewê bi rê da bigihêşta wan û Osê xelas bikira. Lê nehat û li ser şora xwe nesekinî.

Ûsiv bi tenê, li kûna girê moza ê li nav terleyên gund, bîstekê li ser çokan rûnişt. Ew pir vi ber xwe ket. Destê çepê da ber henîyê, kire ofepuf:

–Va çi bêtar e, ku hate serê min. Ezê niha çi xwelîyê vi serê xwe kim! Bi çi rûyî ezê vegerim gund! Ne Hîtoyê malhûle, xwedê stû bişkîne, ê min bi rûswa ke! Na, na, ez wenagerim gund. Ezê serî xwe heynim bi çolê da herim. Ezê herim dîyarên xerîb; yad bim, wenda bim!

Bi hêrs rawû ser nigan û bi lez berî berve çiyayê Qerecdaxê, yê ku li jorî Heymanê bilind tewe, bezîya.

Mîna ku tewên, ba ketiwû ber bivîlan, wî helehel û kelekel wû. Ûsivê kehîl û bêdeng, bi carkê ra hatiwû gûherîn. Mîna bergirekî bejî, wî serî berjor û berjêr dihêjand, geh dibezî, geh jî diloqî û dimeşî. Ziman ketiwû dev. Wî, mîna ku biwêyî, devê turê derd û kulan vekiriwû, û ew li nav şevereşê û berve ezmên belav dikirin:

–Va çi tecelîyê xera ye?! Ma talîyên vê dûnê gîşt ji min ra dane! Veqas derd û kul, zêf û nerindî, Xwedêkê, kî yê texemul bike?! Xwedeo, tu nabînî, tu nawîzî, sûcê min çi ye? Guneyê te qet bi min naye! Mal û milk berde, zewacek jî te nekire para min, zewacek!

Bi van gotinan va, kelgirî bû, horhor girî û qirî...

(dûmayî heye)

www.arsivakurdi.org

Hemê Mûsê

(Hemê Gozê)

"Ez Hemê Mûsê me, rîcalê xeybê me
Qesabê serê kûçkê romîya me"

Hemê Mûsê li nav Kurdên Anatoliyê gelek bi nav û deng e. Bilûrvan li ziravê wî dixin dengbêj kilamên wî tewên. Bilûrvan û dengbêjên ku zirave û kilamên Hemê nizanibin wek hunermend nên hesabkirin. Çimkî pîvanga hunermendî û dengbêjiyê zanîna kilama Hemê Mûsê ye. Ji kilamên Hemê ra tewên kilamên egîtîyê.

Min bi xwe navê Hemê Mûsê pir bihîstîye, lê malûmata min a li ser jiyana wî pir kêm bû. Min jîyana wî pir meraq dikir. Hemê Mûsê kî ye? Ji kê derê ye? û hekata wî çi ye?

Di meha 10an a sala 2001ê de, hevaleki min; Mahmûd Lewendî, bavê xwe ji Dîyarbêkîrê hatibû. Ez bi munasebeta ziyareta bavê wî li mala wan bûm. Navê bavê wî Îbrahîm Pakdemir e, 77 salî ye û li herêma xwe dengbêjekî bi nav û deng e. Ji me ra henek kilam gotin, di nav wan kilaman de kilama Hemê Mûsê jî hebû. Meraqa min her ku çû zêde bû. Wexta ku bavê hevalê min kilama Hemê Mûsê digot dilê min zîz û hevîyên min mezin bûn. Em wek cografîk wiqas ji hev dûr, lê di kilama Hemê Mûsê de jî wiqas nêzîki hevdû bûn.

Hemê Mûsê bi xwe ji eşîreta Berêz (Berazan) e. Aşîreta Berêz parçeyek ji aşîreta federasyona Ertûşa ye. Aşîreta Berêz ji Botanê ye û koçer in. Lê wexta ku meriv kilama Hemê dixwîne, tê de navê aşîreteke din jî derbas dibe, navê wê aşîretê jî Gêtîk e. Xuya dike ku du aşîret bi hevdu ra dijîn: Berêz û Gêtîk.

Wek ji navê wî jî xuya dike, navê bavê Hemê, Mûsa ye, navê diya wî jî Gozê ye.

Navê jina wî Tirkê, navê keça wî Nûr, navê xwunga wî Telî Şarê û navê birayê wî jî Kino ye.

Hemê wexta ku bangî dîya xwe dike xwe weng dide naskirin:

www.arsivakurdi.org

Dayê dêranê
Ez Hemê me
Ez Hemê Gozê me
Ez kevirê kozîkê
Risasê erdê me
Ez melkomotê mewtê me
Şevgerê nîvê şevê me
Ez kekê Têlî-Şarê me
Ez deqmokê navçavê canbêzarê deşta Mûşê me
Ez gurê roja qewamê me,
Dayê dêranê.

Sal 1847 e. Osmanî ji bo beristina (êrîşa) ser kurdan haziriya xwe dike (Şerê li dij mîrê dawî yê mîrîtiya Botan, Mîr Bedirxan e). Ji bo vê meqsedê Îstenbolê serfermandar Osman Paşa şande Botanê. Osman Paşa ji bo ku hejmara askerên xwe zêde bike seferberlîk îlan kir û nifûsçî şandine nav kurdan ji bo ku kurd hem asker bidin û hem jî vêrgî. Yek ji wan nifûsçîyan tê bin konê Hemê Mûsê;

Hemo,were ser qurêo
Bikşêne çîtikêo
Bide baş gumrikê salan û salêo
Xwe bike taba axa û axelerên di dinêo
Li xwe nerake fermaneke dewletêo.
Heçî barê hukumatê himlê risês e, barî xweo
Du xortkê Gêtîk û Berêz bide eskerîyêo

Hem;
Ez çi bikim, mi xebera xwe gotîye
Ez nahêlim xortê Gêtîk û Berêz herne ser sînora
Rahêlne kevçîyê xwe, herne ser qerwana
Heta ez sax bim ez nahêlim destê xwe hilkêşînin di cilê nîzama teng e.
Birayê Hemê Kino ji wî nifûsçî ra dibêjê;

Teres! ez nayême ser qurêo
Ez nadim baş gumrukê salan û salêo
Ez xwe nakim taban axa û axalerê li dinêo
Ez destê tu xortê Gêtîka û Berêz nagrim nadime eskerîyêo
Ezê li xwe rakim fermana dewletêo

www.arsivakurdi.org

Şer dest pê dike. Osman Paşa bi alîkariya hinek aşîretên kurdan, aşîretên arab û bi yardimatîye giregirê aşîretê Hemê ku navên wana Îzêr û Meto, Berhoyê Melle-Hesen, herdu bira esîr heytenê û dikûje.

Destana Hemê, ji bo xwe naskirin, nasnameya netewî û tarîxa kurdan, folkloreke gelek muhîm e. Folklor ji bo kultureke hevpar (ortax) roleke pir hêja dilîze.

Destana Hemê, der bi der hatiye guhertin. Li hinek ciha li gora rewşa aktûel hin tişt li destanê zêde, ya jî kêm kirine.

Destana Hemê, cara siftê S. Haykûnî nivîsîye . Ordîxanê Celîl û Celîlê Celîl sala 1982 li Sûrîyê, Destana Hemê Mûsê, ji devê Silo Koro-Silêmanê Remoyê Feqe guhdarî dikin û dinivîsin û di kitêba *Zargotina Kurdên Sûriyê* de neşr dikin.

Sefoyê Asê

FERHENGOK

Dêran: Dertli, çaresiz
Kozîk: Mevzi
Risas: Kurşun
Melkomot: Azrail
Çîtikê: Kura çekme
Gumrik: Vergi
Taba:Zumre
Qerwana: Karavana
Qure: Kura

Çavkanî:

- *Roja Nû* (rojnameya Kamûran Bedirxan) Weşanên Jîna Nû, Stockholm 1986
- Celîle Celil, *Zargotina Kurdên Sûrîyê,* Weşanên Jîna Nû 1989
- *Yeni ve Yakın Çağda Kürt Hareketi,* Jina Nû Yayınları 1991
- *The Kurdish Tribes Of the Ottaman Empire*, Mark Sykes, London 1908

www.arsivakurdi.org

BAJAREKÎ KU BÛYE ŞAHÎDÊ DÎROKÊ

Rohat Alakom
ralakom@yahoo.com

Bajarê Silîva (Martyropolîs, Mayafariqîn, Farqîn, Sîlvan) bajerekî gelek kevn e. Niha bi Dîyarbekirê ve girêdaye. Bakûra Dîyarbekir dikeve. Dema yek ji dûr ve Silîvayê mêze bike wê tavilê fam bike ku çima Silîvayê di dîrokê de roleke wusan mezin lîstîye. Bajêrê Silîva, ev çîyayên asê ji xwe re kiriye sîper. Mirov dikare bêje ku van çîyan giringiya bajêr zêde kiriye. Silîva di dema Împaratoriya Romayî de wek cepexanekê dihate hesibîn. Dema min dest pê kir kontaktên kurdan û vîkîngan lêkoland, ji nişkêva bajarê Silîva derkete pêşberî min. Bi sedan sîkkeyên ku berî hezar salan ji Silîva hatibûn Swêdê ji aliyê arkeologan de dihatine dîtin. Silîva kîder? Swêd û Bakûr kîder? Silîva paytextê Mîrîtiya Merwaniyan bû. Ev mîrîtiya kurdan di navbera salên 983-1085'an de berdewam kiribû û li vê deverê hukimdarên kurdan yên navdar gîhiştibûn. Qeyserê Bîzansî Basilieos II li dora salên 1000'î bi parêzkarên xwe - bi vîkîngên bakûrî - ve di van salan de dema ji seferekê vedigere Merwaniyan zîyaret dike. Delîlên van minasebetên kevn li ser axa Swêdê derketine holê. Bi sedan sîkkeyên (pere) Merwaniyan li Swêdê hatine dîtin ku di sedsala dehan




Qela Zembîlfiroş li Silîva Foto: R. Alakom

vîkîngan anîne Swêdê.

Çawa em dibînin di van salan de dewletok û medeniyetên giring yên kurdan pêk hatine. Piştî van gerên dîrokî bi rastî derbarê Silîva de ev çend sal in heyranîk li bal min pêk hatiye. Ez bawer dikim ku piştî pêwendiyên kurdan û vîkîngan derketin holê, Silîva zêdetir bala min kişand û *Silîvaheziya* min zêdetir bû. Ji ber ku gelek sîkkeyên ji dewra Merwaniyan li Swêdê ha-

www.serxwakurdi.org



Bergê pirtûka *Me helal bikin*

tibûn dîtinê. Bi taybetî jî li girava Gotlandê. Mirov dikare bêje ku Gotland û Silîva angorî min bibûn du dever û du navçeyên dostanetiyê û biratiyê. Di dema amadekirina vê xebatê de min mêze kir ku navê Silîva (Majafariqîn) di çend çavkaniyên kevn yên swêdî derbas dibe. Silîva li Swêdê ji zuda hatibû nasîn. Derbarê Silîva, merwaniyan û vîkîngan de zêdetir zaniyarî di lêkolîneke min de cîh girtine. (R. Alakom *Svensk-Kurdiska kontakter under tusen år* - Di Nav Hezar Salî de Pêwendiyên Kurdan - Swêdiyan, Apec, Stockholm, 2000).

LITERATURA SILÎVA DEWLEMEND DIBE


Di sala 2001'an li Stockholmê du pirtûkên Mehdî Zana derbarê Silîva, di nav Weşanên APECê de derketin. Navê ya yekemîn *Me Helal Bikin* û navê ya din Çarşiya Silîva ye. Pirtûka *Me Helal Bikin* bûyerên piştî salên Serhildana Şêx Seîd tîne zimîn. Lê belê Çarşiya Silîva zêdetir pirtûkeke otobîyografîk e. Bi stîleke têkil, bi stîla roman, bîranîn û dîrokî ve hatiye nivîsîn. Pirtûk me dibe salên piştî 1950'yî. Salên zaroktî û xortaniya nivîskar ku li Silîva derbas bûne. Herdu pirtûk jî him ji aliyê kronolojîk de, him ji aliyê temayê de mirov dikare bêje ku hev temam dikin. Ji ber ku tema herdu berheman jî Silîva ye.

Pirtûka yekemîn *Me Helal Bikin* bi hacm û firehbûna xwe ve pirtûkeke ne zêde fireh e. Min carekê de xwend. Mirov naxwaze dewama wê bimîne rojeke din, eger di nav wê rojê de tiştekî giring neqewime! Di vê romanê de girtin, dardakirin û nefîkirin heye. Sal sala 1926'an e. Serhildana Şêx Seîd têk çûye. Hikmeta Tirkiyê dixwaze koka kurdan bîne. Facîa, afat, qeza û belayên mezin di van salan de li dorberê Dîyarbekirê tên serê kurdan. Nivîskar di vê romana xwe de me dibe devera Silîva. Vê eniya serhildanê me dide nasîn. Şêx û begên kurdan dor bi dor tên girtin. Yek ji wan jî Şêx Ezîz e. Dema leşker tên û dora gund digrin, Şêx Ezîz zûda ji gund derketiye û çûye xwe veşartiye. Piştî gelek tirsfirandin û tehdîtan, qomandarê leşkeran biryarê girtina du zarokên Şêx Ezîz dide. Ev zarokên piçûk, yek heft sali ye, yê din deh sali ye. Lîstik kivş e: Heta bavê wan teslîm nebe, ev zarokan jî nayên berdan. Zarok bi peyatî, pêxas didin pêşiya leşkeran, bi seetan rê diçin û di dawiyê de tên navça Silîva. Hikmeta Tirkiyê wan digre û davêje girtîgehê.

www.alsvarkurdi.org

Ev romana dîrokî bi serpêhatiya van herdu zarokan ve dest pê dike. Hemû kesên ku li derdorê Silîva tên girtin û li Dîyarbekirê tên berev kirin. Paşê hinek ji wan tên îdam kirin. Hinek ji wan nefiyê Manîsa, Bursa û Îzmirê dibin. Hersê peyvên navê romanê: *Me Helal Bikin* cara pêşîn ji devê girtiyên Dîyarbekirê derdikevin yên ku wê di nav çend seetan de bên îdam kirin. Ev peyvên xatirxwastinê wusan jî paşê dema nefîkirinê (sirgûn) dema ku refên qafîleyên kurdan li Manîsayê ji hev tên qetandin, ji devê wan derdikeve û careke din tên tekrar kirin. Nefîbûn (sirgûn) bi van gotinan ve wek îdamê tê zimîn. Xelqê nefîbûn wek mirinê dîtiye. Riya hat - nehatê ye. Fîlozofiya xelqê derbarê xerîbî, nefîkirin û tengezariyê de bi kurtî wusan hatiye zimîn: *Me Helal Bikin!* Navê romanê navekî gelek bi îsabet e. Romana *Me Helal Bikin* pirtûka êş û kederê ye. Pirtûka hesretê ye. Çav hertim li rê ne! Di van salan de çawa tê zanîn bi hezaran mirovên reben û bêgune nefiyê Anadoliya Navîn û Anadoliya Rojava bûne. Ev pirtûka Mehdî Zana derbarê nefîbûnê de berhemeke gelek balkêş e.

Lê belê pirtûka duwemîn ya bi navê *Çarşiya Silîva* zêdetir dişibîne pirtûkeke bîranînan. Mirov dema vê pirtûkê dixwîne kêfa mirovan tê. Bîna mirovan fireh dibe. Mirov derbarê Silîva de gelek tiştan fêr dibe. Berhemeke hînkar e. Çawa di destpêka pirtûkê de nivîskar dide diyar kirin, bi nivîsa vê pirtûkê ew dixwaze herdu zarokên xwe, destên wan bigre û gelek zarokên mayîn yên kurd li Silîva bigerîne. Ne tenê zarok, nivîskar me salbihuriyan jî dibe Silîva. Çi gereke xweş. Nivîskar bi xwe jî careke din dixwaze




Bergê pirtûka *Çarşiya Silîva*

bi alikariya bedewiya peyvan here bajarê zaroktiya xwe. Mehdî Zana wek dilsazekî, doxtorekî dixwaze wan birîn, êş û kederên ku di pirtûka Me Helal Bikin de derbas dibin, bi alikariya pirtûka duwemîn Çarşiya Silîva, bipêçe û xweş bike.

Nivîskar di Çarşiya Silîva de me kuçe - kuçe, quncik - quncik li Silîva digerîne. Ji salên 1950'yî vir de gelek şaxsiyet, bûyer û dorberên Silîva me dide nasandin. Xortên ku xwîna wan hevraz davêje di van salan de dixwazin dinyayê biguhirînin, sero-bino bikin. Qedera dinyayê, qedera Tirkiye û qedera Kurdistanê di van salan de çawa em dibînin di dikan, qawexane, çayxane û karcîhên Sîlîvayê de hatine tayîn kirin. Sohbet û giftûgoyên van salan karibûne qedera dinyayê jî tespît bikin.

www.arsivakurdi.org



Maleke kevn li Silîva Foto: R. Alakom

Em di vê berhemê de rastî nifşeke romantîk tên. Di vê çarçevê de Nîyazî Hosta - hevkarê nivîskar xemlekê dide pirtûkê. Him uslupa Mehdî Zana û him jî mîzahkariya Nîyazî Hosta - yek ji qehremanê pirtûkê - kalîta pirtûkê mirov dikare bêje ku zêde dike.

Nivîskarê pirtûkê Mehdî Zana bi xwe ji Silîvayê ye. Bi salan di zîndan û girtîgehan de jîyana xwe derbas kiriye û îşkence dîtiye. Di salonên dadigehena de hatiye-çûye, bi zimanê kurdî îfadeyên xwe dane. Rûmeta kurdî cara pêşîn li Tirkiyê di wan salan de zêdetir bilind bûye. Mehdî Zana di vê merhalê de roleke mezin lîstiye. Xanima wî ev çend sal in çawa tê zanîn li paytextê Tirkiyê, di zîndanê de ye. Salên xwe dipê. Kurê wa Ronay li Amerîkayê, keça wan Rûken nigekî wê li Ankarê, nikekî wê li Fransayê ye. Malbateke perçekirî...Malbateke wêrankirî... Tam babeta romanekê. Mehdî Zana ev du sal in bi xwe li Swêdê tevî koçberên kurd bûye. Li geliyên nefîyê de rojên xwe derbas dike. Lê belê Mehdî Zana tijî enerjî ye. Vala namîne. Ew hêviyan dêhêrîne. Di nav van du salên Swêdê de di pirtûkên xweşik bi zimanê kurdî amade kir û da weşandin: *Me Helal Bikin* û *Çarşiya Silîva*. Bîranîn û hafiza xwe ya derbarê vî bajarî de rokiriye ser kaxiz. Xwezila her kes wek Mehdî Zana bibûya heyranê devera xwe, dîrok, folklor û zimanê xwe. Wê çaxê gelek bedewî, dewlemendî, rengînî û tonên kultura kurdan wê derketa holê. Karên dîrokzanan û lêkolîvanan jî gelek hêsa dibû. Divê mirov bi babetên piçûk ve dest pê bike. Ji ber ku herkes devera xwe baştir nas dike, her mirovek hosta, zana, pispor û aşiqê devera xwe ye. Wek Mehdî Zana divê her kes li koka xwe vegere û koka bigere.

Mehdî Zana bi weşandina van herdu berhemên xwe ve lîteratur û bîblîyografya Silîva bi rastî gelek dewlemend kir. Bala xwendevanan careke din kişande ser vî bajarê kevn û xweşik. Ji bo naskirina bajarê Silîva berhemên Mehdî Zana firsend û îmkaneke baş dide mirovan. Çawa me li jor jî dît ku *Ferhenga Silîva* ji aliyê dîrokî, sîyasî û kulturî de gelek balkêş e. Çend peyv jorîn û jêrîn ku di vê ferhengê de cîh girtine her yek bi serê xwe gelek tiştan îfade dike: Bîzans, Roma Reş, Martyropolîs, Mayafaqriqîn, Silîva, Merwanî, Vîkîng, Swêd, Gotland, Kela Zembîlfiroş, Pazara Şêytîn, Camiya Selahattîn, Pira Mala Badê, Sîyabendê Silîvê, Xeca Bextreş, Şex Seîd, Îdam, Sirgûn, Mehdî Zana, Leyla Zana, Nîyazî Hosta, Kuştin, Lêxistin, Fail-i Meçhul,

www.arsivakurd.org

Ezîyet, Îşkence, Nefîkirin (Sirgûn)...Bi sedan babet.


Tenê kêmasîke van herdu pirtûkan ya piçûk heye. Tarixa çapkirinê ya herdu kitêba hatiye ji bîr kirin. Divê em bidin diyar kirin, ku ev herdu pirtûk jî di sala 2001'an de li Swêdê çap bûne.

ROJEK LI SILÎVA

Di bahara sala 2001 meha Gulanê ez çûme çend bajarên Kurdistanê geriyam, wek Dîyarbekir, Mardîn û Riha. Rojekê çûme Silîvayê jî û min ev bajarê qedimî bi çavên xwe dît. Ev cara pêşîn bû ku ez li vê deverê digeriyam.

Dema ez çûme Silîva li vir min gelek cîh dîtin. Sûka bajêr, sûr û kaniyên di nav sûrê de, malên kevn, koşka Mala Ezîzoxliyan û Koşka Mala Beg ez dibirim sedsalên kevn. Çûme Şeytan Pazarî (Çarşiya Şeytîn) û çûme Çarşiya Silîva ku bûye navê romaneke Mehdî Zana. Çûme tax û kuça mala Mehdî Zana, mala dê û bavê wî. Min Qela Zembîlfiroş dît. Em çûne hin mal û cîhkarên Sîlîvayê.

Gelek malên xweş yên kevn bi keviran ve çêkiribûn. Dîrok, tebîyet û mirovên rind! xemlek dabûn vî bajarê dîrokî. Destanên Zemfîlfiroş û Hecê-Sîyabend careke din li vê deverê li ber çavên min re derbas dibûn. Paşê em ji Silîva derketin berbi deverên dorberê bajêr çûn. Min cara pêşîn gundekî ji aliyê leşkeran de valakirî li kêleka rê bi çavên xwe dît. Çawa tê zanîn gelek gundên Kurdistanê, ji ber tedbîrên emnîyetê! ji aliyê hikmeta Tirkiyê de hatibûn vala kirin û xirab kirin. Paşê ez fêr bûm ku navê vî gundî Gundê *Xirabguriya* ye. Carina jê re dibêjin *Xirba*. Ji navê gund jî tê xuyan ku qedera vî gundî ji zûda kivş bûye, belkî jî berî



Camiya Selahattîn Eyûbî Foto: R. Alakom

sed salan. Valakirin, wêrankirin û xirabkirina gundan berê min di medyayê de xwendibû û bîhistibû. Lê belê waha nêzîk ve min gundekî wêrankirî û valakirî tu wext nedîtibû. Gund kavil û xopan bibû. Vî gundî bîna mirovan teng dikir. Em ji wir dûr ketin. Em çûn li derdorê Pira Mala Badê. Li wir manzareke gelek xweş hebû. Her der kesk û şîn bû.

Di vê sefer û gerê de bi taybetî Nedret Biliciyê gelek alikariya min kir. Ji ber ku ev navça, devera cîhê zaroktiya wê bû. Li vir hatibû dinê. Nedret Biliciyê çend kûçe û malên hin hevalan nîşanî min da ku niha li Swêdê dijîn. Nedret Bîlîcî bi xwe jî Silîvayê ye û niha jî li Swêdê dijî. Çawa tê zanîn îro kolonîke kurdên Silîvayê li Stockholmê heye. Hejmara wan gihiştiye hezaran. Di salên 1970'yî de hatine û heta niha jî koçberiya wan berdewam e.

www.arsivakurdi.org

Yek ji wan kesên ku cara pêşîn ji Silîva hatiye Swêdê, Zekî Tekeş e...Di salên 1970'yî de hatiye. Belê di sedsala 10 û 11'an de vîkîng çûbûne Rohilatê û niha jî piştî hezar salan vê carê kurd hatine welatê wan!

Di vê gera xwe de em demekê li Silîva bûne mêvanê xanimeke kurd - Ato Xanim. Salên wê dora şêstî bûn. Li mala wê de jineke din jî hebû. Nan dipetin. Tavilê Nedret nas kirin. Gelek kêfxweş bûn. Nanê germ, penêrê sipî û rûn ve tevayî hevrîşk îkramî me kirin. Zaroktiya min ji ber çavên min re derbas bû. Nanpetina dîya min hate bîra min. Min cara pêşîn li Silîva, xwe li Kurdîstanê hîs kir.

Lê belê çend gotinên vê xanima kurd ez gelek êşandim û xofeke mezin xiste dilê min. Ev bajarê xweşik carekê de ji min reş vehat. Ev xanima gelek bi dilkovan û dilşkestî bû. Bi dilekî keser wusan vedigot: *"Di destpêka 1990'an de Silîva bibû bajarekî mirî û bêdeng. Ez serê we sond dixwim birano! piştî nîvro, seat dibû çar, herkes diçû mala xwe û dernediket. Dengê dîk-mirîşkan, se-kuçikan û tu mexlûqetî nedihat. Xelk ditirsiya. Belake nedîtî û giran bû. Herroj yek-du kes di orta royê de dihatin kuştin. Paşê jî kesên qatîl dihatin li ber çavên me dikeniyan. Xelk zef tirsiya bû, nikaribû tiştekî jî bike. Di van salan nêzî 500 kes hate kuştin. Dewlet, polês û leşker bi nav van kuştinan de bûn. Di dawiyê de piraniya Silîva bar kir çû Ankarê, Îstanbolê û deverên mayîn."* Van gotinên vê jina Sîlîva, careke din navê Silîvayê yê dewra Bîsansê anî bîra min: *Bajarê Şehîdan* (Martyropolîs). Di zimanê Yunanî de *martyr* tê maneya şehîd, *polîs* jî tê maneya bajar. Belê piştî hezaran salan dîsa mirov li vî bajarî dihatin kuştin. Nêzîkî 500 kes şehîd ketibûn, can dabûn. Dewrên berî hezar salan û rojên îroyîn li Silîva dema vê seredana min de gazî hev dikirin. Gelek tişt dianî bîra mirovan. Ji ber van danberhevdan û rûberîhevkirinan mirov gelek diêşiya û bînteng dibû. Bi kurtî gotinên jorîn yên vê xanima kurd li Silîvayê ez gelek hejandim. Çawa dibe di nav çar salan de cîhekî waha piçûk de 500 kes bêîz û bêçop dihatin kuştin? Silîva vala bibû. Silîva bibû bajarê êş û kederê. Bi kurtî em dikarin bêjin ku Silîva bibû wek bajarekî dewra Bîzansê û navê xwe yê antîk dîsa xwe kiribû: *Bajarê Şehîdan* (Martyropolis)...

Lê belê divê ez vê yekê jî bêjim ku di vê gera ya sala 2001'an de min li Silîva ne tenê derd û kul nedît, ji aliyê din min manzareke xweş jî dît. Qaweyên înternetê vebibûn. Xort bêtirs dihatindiçûn. Hejmarên wan kêm bin jî, li bal hin mirovan hêviyên pêşerojê bejn didan. Piştî ewqas ezîyet û lêdan, piştî kuştina 500 kesan, mirov dîsa bi şermoke! dikaribûn bikeniyan. Hejmara wan ne zêde bû. Dîsa jî em rastî çend mirovên beşerxweş û rûken dihatin. Mirov dikare bêje ku Silîva ji bûyîna *Bajarê Şehîdan* (Martyropolîs) derdiket, hêdî hêdî dîsa dibû Silîva. Di demeke xweş de em çûne vê devera Kurdistanê. Meha Gulanê bû. Bahar hatibû li Silîva. Bi rastî Silîva dikeniya!

www.dersvakfi.org

Dîroka du nûvedanên vexwarinê

5.000 sal berî niha cara pêşîn bîra li çiyayê Zagros hatiye çêkirin

Sumeran 5.000 sal berî niha bîra vedixwarine. Sê lêkolînerên Bakurê Amerîka piştî lêkolînên xwe yên zanyarî bi dokumentên kîmyayî îspat kirin ku 5.000 sal berî niha li qontara çiyayê Zagros bîra hatiye çêkirin. Lêkolîngerên Amerîkayî encama lêkolîna xwe di sala 1992an de di kovara NATUR de weşandin.

Lêkolînger li ser qafikên ku 3.500 sal berî Mîladê hatine çêkirin rastî hinek lekeyên zer hatine. Ew leke şopên tîrbûna kalsîyûmê ne û di heman demê de ji heywana ceh çêbûne. Ev nûvedan (kefşa) li başûrê rojavayê Zagrosan pêk hatiye. Di encama lêkolînê de hatiye peyîtandin ku berî Mîladê di navbera salên 3.500 - 3.100î de li rojavayê Îran û bakurê Iraqê[1] bîra hatiye vexwarin. Li gor van hersê lêkolîngerên Amerîkî di wê demê de li wê herêmê çandiniya ceh jî gelek pêşketîbûye.

Welatê meyê dîsa çiyayên Zagros û Cûdî ne

Serokleşker û nivîskarê Yewnanî Ksenefon di pirtûka xwe ya **Vegera Dehhezaran** *de (Berî Mîladê 401-400) ku ji sefera Îranê vedigere Yewnanistanê, ew mecbûr dibe ku bi eskerên xwe ve di çiyayên Zagros û Cûdî re derbas dibin. Ksenefon di vegera xwe ya Zagros û Cûdî de behsa bav kalên Kurdan ên wê demê KARDÛKIYAN dike. Eskerên Yewnanî mal û gundên Kardûkiyan talan û wêran dikin. Agir berdidin mal û gundên wan û disotînin. Ksenefon li ser rewşa şerê navbera xwe û Kardûkiyan û jiyana wan dûr û dirêj dinivîse. Di nav vê nivîsara dirêj a dîrokî de weha behsa meya (şeraba) Kardukiyan jî dike:*

„... Piştî şerekî dijwar eskerên me (Yewnanî) êrîşeke mezin û dijwar birin ser gundekî Kardûkiyan. Kardûkî gund û malên xwe bi paş ve hiştin û ew ber bi çiyê ve revîn. Pişt demekî kurt artêşa me hêzê xwe kom kir û dest pê kir û ketin malên Kardûkiyan. Di malên wan de gelek xwarin hebûn. Ji derî xwarinê, ji mehzenên sîwaxkirî û bîrên nav malan dêzik û kûpên mey dîtin. Meya Kardûkiyan wek ava qeşayê gelek sar û bi çêj bû...."[2]

Amed Tîgrîs

1 Çavkanî: Kovara *NATUR* November 1992. Hezar mixabin ku hersê lêkolînvanên Amerîkî gotinên Kurd û Kurdistanê di vê lêkolîna xwe de bi kar neanîne û wek zimanê resmî "rojavayê Îran" û "bakurê Îraqê" bi karanîne.

2 Çavkanî: Xenophon, *Anabasîs III-IV*, 3,2

www.aasvarkurdi.org

ÇARÎN Jİ HÊLÊ SARIZÊ-4

Berhevkar: **Mehmet Bayrak**
Çavkani: **Zeynep Bayrak**

Nazli terî di berê vê ra
Silav şandiye xeber pê ra
Ez silavê wî çir bikim
Î teriye ji xwe wê da

Masayî hewalî min wînin
Îçkiyê gendî li ser dînin
Mezeyî wî ve destî xwe hazir dekim
Dijna min û wî kesî mînin

Şorê min û xwe be yek ke
Potîn min şand tu di pê ke
Eme tarina dawetê
Ba herkesek hewalê xwe belli ke

Çavê reş in çav çîye gir in
Qaş û biri tê da birin
Kî çi debê bira biwê
Ez di havalê xwa nabirim

Çîyayê hana çîya me ne
Tê da kulîlka kabina
Hûn denge kulîlke mekin
Ew kulîlka nazlîyê min e

Dilê min li wî gurmujî
Birayî min dibîzê min dikuju
Zati neyî bê daraw e
Masumpak ê li bunujî

Hûn cîh min û nêzlî rêxin
Bonê kin hûn wî li bexîn
Li çi min li sudekewî
Qutnî li bin nigan rexin

K"em bi teva ekke ekîn
Di gund da çifeteki tekin
Bavî xwe bişîne bira min buxaze
Bira qalê min û te bikin

Ava sarê ji jûr da tê
Bêrê li pî be berli te
Î bêrê pî xwe dînini
Min go ku î berve min tê

Avê sar avê şarlax e
Keçik di navda çiyê parlax e
Çavê min li çavê wê ket
Mêz kirin kirna yasax e

Baran barî av şellî bû
Çîçek li daran belli bû
Hûn navî wê li gulan nin
Destî xwe medini ba belli bi

Baran barî teye teye
Heval wê da here vir da meye
Gotin camê xwe xişbûîne
Bawluskê avite wê ye

Here wê da here wê da
Por şekirye simêl ba da
Ev çalim ê te ji kê re
Ramewirda ber deri ra

Ba tebarkî min bişînin
Ku şandi hûn bi xwe ra wînin
Ez taberkê we vedaşerim
Hata salê tę rokê îni

www.arsivakurdi.org

Şarê te ba min çi ye xweş e
Li sirt fîstanekî reş e
Min ji te ra çi goti bû
Ku tu ji min neyî xwe şe

Meke meke bilmez meke
Fîstanî sur li xwe meke
E dekin te birewînin
Bi şev û ro qaytê xwe ke

Çav li min kir çav li min kir
Di bin qaşan ra bange min kir
Ekî çiqayî bilmez e
Minê ba wî ra baş nekir

Dilî min da dilî xwe ke
Li ser aşqî me yazmîş ke
Deng meke ba kes nebîzî
Aşkî min û teyî tek e

Santil di dest da ji avê tê
Ê dikenî berva min tê
Ê da mi va radebiri
Min go qê ê sava min tê

Şivan tu pezî xwe hes ke
Kurna gendîyan çijî kesk e
Bi derkewe pezî terî
Li fîtke xa tu li bexa

Dilî min li dilî te tê
Gotin hevale teyî be re tê
K"ez rawim bi derikevim
Mina ku binê xwe ji kujan re tê

Por hûnayye qor bi qor e
Li serî çîtek ê zer e
Tu çîtê serî xwe dîne
K" ez bibînim gulyê mor e

Dilî min de rev dilî xwe ke
Serî xwe rake çêv li min ke
Bira dujmun çatlamîş bin
Were here ji min hez ke

Çavê min li bance wî ket
Banca zirav lê li baket
Min bi çavê pîs meznekir
Gotin nazara te lêket

Destî xwe di destî min ke
Dergîsta te kirina bûka
Dujmunî ji qarşîye va tê
Ku çi gotin tu deng meke

Li hêlê male li hêlê male
Teşî di dest da çû ber malê
Çi ba seri vêda hatiye
Hes rakirye nale nale

Baran barî ewr gurmujî
Toli baran pê ra rijî
Tu bi dewî deri mekew
Balusk tavê te dikujî

Tu çekê pişte xwe dîne
Qalem defterê xwe hilîne
Defterê xwe veke mez ke
Navî min û xwe bibîne

Bege min beye, bege min beye
Ku tu nayte qayta ke ye
.....
Xeva hevalê te neye

Navxwaş navî te Ronik e
Tu kulîlka çîyayî hunik a
Kî çi debi bira bibê
Derdê dilî min Ronik e

Lê keçikê la Tavlîyan e
Fîstan qutê la ser junyan e
Çi canê wê hevdu xaryê
Sawa lawikakî Çaxşaxanê

www.arsivakurdi.org

NAVÊN KURDA-2

Rebenî Celikan

Nav	ji bo Jinan	ji bo Mêran
Kiy (Key)	...	Kiyo, Keyo
Lad	...	Lado
Lal	...	Lalo
Law	...	Lawko
Laz	...	Lato
Lik	...	Liko
Lil	...	Lillo
Lol	...	Lolo
Mec	...	Meco
Meç	...	Meço, Meçê, Meçik
Mel	Melê, Melik	Mello
Mem	...	Memik, Memo
Me'm	...	Me'mo, Me'mî, Mê'mîk
Mêm	Mêmik, Mêmiş	Ö
Men	...	Meno
Med	...	Medo
Menc	Mencê	Menco
Mend	Mendê	Mendo
Meest	...	Mesto, Mestik
Meyr	Meyro, Meyrê	..
Mil	...	Millo, Millê, Milik
Miç	...	Miçê, Miço
Miz	...	Mizo
Mist	...	Misto, Mistik
Mirc	Mircê, Mircik	...
Mît	...	Mîto
Mîr	Mîrkê	Mîro, Mîrko
Mûs	...	Mûsê, Mûso, Mûsik
Mîş	...	Mîso
Mok	Mokê	...
Mox	Moxik, Moxê	...
Muh (Mih)	...	Miho, Muhê
Mêy	Mêyê	...
Ned	...	Nedo
Nec	Necê	Neco
Nar	Narê, Narkê	...
New	...	Newo, Newik
Naz	Nazê, Nazik	Nazo

www.arsivakurdi.org

Nin	Ninik	Ninno
Nur	Nurê, Nurik, Noro	...
Nem	...	Nemo
Nof	Nofê	...
Oc	...	Oce
Of	...	Ofo
Om	...	Omê, Omik, Omo
Os	...	Osko, Osê, Oso, Osik
Or	...	Oro, Orko
Pem	Pemê	...
Pert	...	Perto
Pûrto	...	Perto
Per	Perê	...
Piç	...	Piço
Piz	...	Pizo
Pîş	...	Pişko
Por	Porê	...
Pêş	Pêşo	...
Pol	...	Polo
Gend	...	Gendo
Gemş	Gemşe	...
Rind	Rindê	Rindo
Rem	...	Remo, Remik
Raw	Rawik, Rawê	...
Raz	Razik, Razê	...
Rehm	Rehmê, Rehmik	...
Rec	...	Reco, Recik
Reş	...	Reşo
Rizq	...	Rizqo
Sel	...	Selo
Sem		
Sam	...	
...	Semik, Semo	
Samo		
Seb	Sebo, Sebê	...
Sat	Satê, Satkê	...
Ser	...	Sero, Serko
Seyd	...	Seydo
Sêv	Sêvê, Sêvik	...
Sil	...	Silo, Silik, Silê
Sinc	Sincê	Sincik, Sinco
Sim	...	Simik, Simê
Sit	Sitê, Sitik, Sito	...
Sen	Senê	...

www.arsivakurdi.org

Son	Sonê	...
Sos	Sosk	...
Suhr	Suhrê, Suhrik	...
Sut	Sutê, Sutik	
Sûs	Sîsê	Siso
Sin	...	Sino
Sad	Sadûn	Sado
Şef	Şefo Şefyk	...
Şen	...	Şeno
Şar	Şarê, Şarkê	...
Şem	Şemê	Şemo
Şems	Şemso, Şemsê	...
Şên	Şêngê, Şênê	...
Şer	...	Şêro
Mor	Morê	...
Şen	...	Şenbo
Şind	...	Şindo
Şil	...	Şillo
Şix	...	Şîxo, Şîxko, Şîxîk
Şik	...	Şiko
Tek	...	Teko
Têc	...	Têco
Tef	...	Tefo
Tahl	...	Tahlo
Têl	Têlê, Têlik	...
Tar (Tahr)	Tarê	...
Tem	...	Temo
Tit	Titê, Titik	...
Top	...	Topo
Ton	Tonê	...
Tot	Totê	...
Tor	Torê	...
Tum	Tumik, Tumê	...
Tat	...	Tato
U'm	...	Umo, Umik, Umê
Ur	...	Urê
Ut	...	Uto, Utê
Val	...	Valo
Yad	...	Yado
Yax	Yaxik	...
Yar	...	Yaro, Yarkê
Yaş	...	Yaşo, Yaşko
Ran	Rannê	...
Ten	Tenê	...

www.arsivakurdi.org

Ruh	Ruhê	...
Yam	...	Yamo
Yeh	...	Yeho
Yek	...	Yeko
Qenc	...	Qenco
Wet	Wetê	...
Qed	Qedo, Qedik	...
Qas	...	Qaso
Qic	...	Qico
Qiz	Qizê, Qizik	Ö
Qoç	...	Qoço
Qil	...	Qilê
Qiç	Qiçê	
Qut		
Qer		
Qutê		
Qerk	...	
Qero		
Zel	Zelê	Zelo
Zex	Zexik, Zexê, Zexo	...
Zer	Zerê	Zero
Zêr	...	Zêro
Zên	Zênê, Zêngê	...
Zêw	Zewê, Zêwik, Zêwo	...
Zek	...	Zeko
Zêt	Zetê	Zeyto, Zeto
Zêz	Zezê	...
Zib	...	Zibê
Zilf	...	Zilfo, Zilfê
Zor	...	Zoro, Zorgo
Zoz	Zozk	...
Pit	Pitê	...
Tew	Tewo, Tewik	...
Us	...	Uso, Usik
Heyd	...	Heydo
Zar	Zarik Zêhrê	...
Sew	Sewo, Sewik	...
Kim	...	Kimo
Şew	Şewê	
Şer		
Şerê	...	
Gum	...	Gumo, Gumê
Lel	...	Lelo
Paç (Paş)	...	Paçko, Paşko

www.arsivakurdi.org

Kurtejiyana min-2 (*)

Bekir Darî

Çend hêjmarin ku deng ji min bi dernakevê. Sebeb û (bahanê) min hêne. Daxwazîya min ewe ku hun hînabikin. Çimkî ez wendabûm. Min ne dizanî ku ez î li ku derê me. Li wir ne postxanê hêbu ne jî têlefon. Telefona min ya mobîl jî min li ser kanîyêkê bîrkiribû. Ji bo we min bi şihanekir ku ez xeberê bi we gînim. Ez Li ber kanîyê gerîyam:

Kanî, kanî kanî
Av sar kanî
Ka telefone min
Ê mobîl kanî(e)

Kanîyê, berpirs neda min! Çimkî, ave wê ê pirr sar bû. Ji bo wê devê kanîyê cemidîyabû. Hina bikin ku, min ava wê ya sar vexwar bi şunda lêvê min jî cemidîyan û min bi sihanekir ku ez dengkim.

Wan rojên ku min xeber nedaye we pir tiştên mûhîm, hendik mûhîm muhaqêq bûn...

Jîyan, derîyê tiştekî çavnake. Balê, jîyan ê mîna avê çemekî çê yê. Ew dixwazê ku herdem bi hiz, bi lez birije û bi rê ya xweda here. Kesên ku bi şiha kirin û gavê xwe li gorê lêza çêm avitin, ew ên bi wêre harin, kesên gavgiran mecbur xatir ji jîyanê xastin û laşên wan li ser kevir û kume ma. Bu xarin, ji kur m û wêza ra



(*)Beşê yekemin ya vê nivîsê di hejmara 10an de hatibû çapkirin.

www.arsivakurdi.org



Ji bo wê, her subê ku ez bi xwe hesîyam, jimastîka sube birnakim. Mina balêrîn ê narîn li ser sim ê xwe çerxbûm û wa name ji wera niwisîya...

Keç û xortên heja!

Ez dixwezim ku bi were sirrekê parrkim. Di jîyan e we ya ciwan de carekê li »rohelati« nê serkin! Her tiştên di ji bîrbikin.

Ez î baver im hîngê hunê fahm bikin ku;

Azadî çiyê

Ji wê rûmetir, ji wê bi kîmettir qet tişt li dinê tuneye! Tama wê ku ketê davê we ew ya li ser zimanî we bime û xazîyê we mina şekir ê ekîdê, mîna hêngûv şîrin bihîle...

Ew, sê-çar dekîkên ku li dij rohelatî derbaskirînê Ez bi malî dinê naguhêrim..



Hîna bikin ku ji we bi şûnda, ez benî koletî û zordestî nakim stuye min î dirêj.

Ji wan dekiken romantîk derbasbun bi şûnda em dîsa derketinî rê.

Ma em çi bibînin?

www.arsivaKurdi.org



Marek î çavê xweyî bi muj û duman, berdayê ser beq ê ka çav pelçikivî û beq ê çav pelçikivî jî çavê xweyî pelçikivî berdenê gulbang ê ki guh ker û lal.

Bi dizî wan tîmsah jî di nav avê de li derîya wan çavdike...

Bi qîrrînîya min giş tev-hev vecinikîyan û guh dan ser gotinen me.





- Hun, çi dikine loo?

Mîna ku hun gîş dizanin mare kerin
û ji bo wê nabihîzin. Tîmsah ji qet
kiymet neda me. Beqê denge xwe rakir;

- Silav ji were, kerê ezîz û kirde kun sur!
Min bi dengê xwe yî kehîl got;

- Qet fedî û heya li ba wê tuneye, hun ji
Xwêde jî natirsine ku we dest kirîye
kirrqê hevdû.

Baqê got:

-Zikê minî birçî ye!

Di vê navberê da mişkîgênim (Wît-Wîtok) bange ma kir

-Li paş xwe binêrin!


Ma li paş xwe mezekir ku em çi bibînin!

www.arsivakurdi.org

Yêk î zik girr, çav palçiqivî nezîkî me bûyê. Şekil û şamelê wi qet neçû bîza min.

Min dixwest ku ez birevim

Emma.....





Wî, lepê xwe î tijî cê dirêje min kir. Av bi devê min ket (Zatî ez binarek î mezin û çillek im) û min gahnkirin ez nezîkî zik girr bûm. Tame cê li bedena min belav bû. Ku di bedena min e çillek da vere ha!

Min, azadî û serfirazî birkir..





www.arsivakurdi.org

Siwe da rawûm çîk eyaz e
Navê rindê Gulbeyaz e
Bi dizikî go, eşkere nekir
Ma ew zalîma nebihîze

Kera mamê kera mamê
Guhe ve mîna qamê
Kera mamê kera mamê
Tev debrûsê mîna camê



Zikgir ji bo çi weqes şiha bû ezê nizenime. Wî bi rê de kilam digotin û em diçûnî.

Kergu kê li me ser dikir. Nizanim ku ji bo çi?

Kerguyî pirr mijûl bû û ji xwe dipirsiya;

-Loo! Tiştekî me î bi we kerêwa mina hevdû hêyê ema ku çi yê min bi dernexist ! Ellah ellah !..

Ji bo

»UMREN, DÎLAN, AYTEN, SEVGÎ Û FURKAN re«

Umren, Tu ê ji bo min çavê Dîlanê, Dîlan tu çavê Aytenê, Ayten tu çavê Sevgiyê, Sevgi tu jî çavê Burkan paç ki. Ez jî çavê we gîya paç dikim. Bi xatirê we.

www.arsivakurdi.org

Kuştina 'teyrê ser milê qîz û bûkan' Dengbêj Ferzê

Salihê Kevirbirî

Dengbêjê bi nav û deng Ferzê ango Ferzende, ji gundê Kevir a Melazgira Mûsê ye. Di dem û dewrana xwe de wekî *Şahê Dengbêjan* û 'Teyrê ser milên qîz û bûkan' dihate naskirin. Li warê Serhedê yek ji dengbêjên herî mezin û bi kêf bû.

Wekî tê zanîn, ji berê ve di nava eşîrên kurd de rikeberî, kîn û edawat hebûye. Dîsa li gorî saloxdayînan, li ser rikeberiyeke wisa, di dawetekê de dengbêj Ferzê ji hêla Zekiyê Lawê Mîralî ve hatiye kuştin. Li gorî hinek kesan jî ev yek ne rast e. Piştî kuştina Ferzê, dengbêjê navdar Reşo ku mamosteyê Şakiro ye, li ser wî kilamekê çêdike ku emê niha li jêr bidin. Lê berî wî em hinekî berê xwe bidin roja qewimîna kuştin: Roja ku li gundê Kevir dawet û dîlan çêdibe, ji bo ku were dawetê û çend kilaman bibêje, mûma (dawetname) Ferzê jî dişînin. Wekî bi dehan giregirên dorhêlê, wan mûma Zekiyê Lawê Mîralî jî şandiye. Zekiyê lawê Mîralî ji eşîra Şewêsiya ye û pismamê Fesîhê Mihê Mîrze bixwe ye. Rast e eşîrên kurd bê çek û sîleh naçin şahî û dîlanan. Şesagir (bêsatas) ên wan hebûne. Govend û dîlan xilas dibe, dora siwarkirina bûkê ye. Dibêjin: "Bila Ferzê were kilaman bibêje" Saloxê didin ku di dawetê de 50–60 siwarî hebûne. Bûk derdikeve, Ferzê kilaman dibêje. Di wê navberê de siwarî bi sesagir û berdengeyên xwe guleyan diavêjin. Zekiyê lawê Mîralî gava ji demançeya bi navê 'Malnihêr' gule diavêje, diçe li Ferzê dikeve. Malnihêr, sesagirê wê demê bûne. Ferzê li cihê şahiyê, ji ber guleya Zekiyê Lawê Mîralî dimire. Gelo ji bo çi Ferzê hatibû kuştin. Di vê kuştinê de qestîbûnek hebû an na? Gelek kesên ji herêmê dibêjin ku, hindê Ferzê dengbêjekî bi nav û deng bû, di civatan de alemê jê hez dikir ku Zekiyê lawê Mîralî jê qehirî û lê xist, kust. Lê Dengbêj Zûlkuf ku bi eslê xwe ji Erzeromê ye, diyar dike ku piştî qewimînê, Zekiyê Lawê Mîralî ji firariyê hatiye gundê wan û ji bavê wî re sond xwariye û gotiye ku gule bi şaşî ji destê wî teqiyaye û Ferzê kuştiye. Belê wekî me li jor jî behs kiribû, Dengbêjê bi nav û deng Reşo li ser wî kilam çêkiribû.

www.kurdi.org

Niha emê bala xwe bidine kilama Ferzê ku çêkerê wê Reso ye lê me ji devê dengbêj Zûlkuf girtiye. Li gorî gotina Dengbêj Zûlkuf, wî ev kilam ji devê dayika xwe ya dengbêj Senemê girtiye....

Xasê digo Nazê
Nazê digo Bîlnazê Bîlnazê digo lê lê Gulnazê Gulnazê
korê ax...
Korê de rabe ezê bi Melazgirê bi
gundê Kevir biketama
Wê bi zeviya ketim way way way

Sibe ye min dêhna xwe dayê
Du heb siwar derketin derê Ferzen
de Şahê Dengbêjan
Teyrê ser milê qîzan û bûkan wî
De bavê Mihemed Salih namekê didane destan
Digo li gundê Kevir dawet e
Kerem ke were kambaxa vê dawetê
way way way

Min dît Ferzende bavê Mihemed
Salih Şahê Dengbêjan
Li malê li Boa siwar bû
Dikete binya mala go sê cara
Di bin da li kinî sivêr ketî
Xasê diçû pêşiyê digo bavo tu neçe
kambaxa dawetê
Digo lê lawo tu nizanî gotinê bapîrê min e
Co sefer ji bavê berê de ji mala
bavê te tê way way way

Birîndaro de deng nayê
Birînxedaro lo de deng nayê
Birîna bavê Mihemed Salih giran e
Dinale dinale dinale dinale
Çima bixew nayê way hahî hahî
Xasê digo Nazê
Nazê digo Bîlnazê
Bîlnazê digo lê lê Gulnazê xweyê
Sibe ye bi Melazgirê bi gundê Kevir
biketama
Soran û son derbas kir

www.arsivakurdi.org

Min dît bûk ji derê malê de hatî
Bavê Mihemed Salih
Teyrê ser milê qîzan û bûkan
Kilam digotê çerxa dawetê saz kir
way way way
Kula Xwedê tu yê bi kulê bikevî
Mala Zekî Lawê Mîralî
Min dît demançekî sesagira Mal
nihêrî
Daye li bedena bavê Mihemed Salih
şahê Dengbêjan
Mîrata gula malnihêrê
Movikê pişta xilas kir way way way

Dibê wezê bi gundê Kevir
Bi Melazgira şewitî biketama
bi dare
Bavê Mihemed Salih ji ser pişta
hespê da ketî erdê
Gazî dike gelî siwaran mala we
xerab be
Birîna min kûr e herî xedar e
Hey Melazgiriyan mala we xerab be
Bidin Şahê Dengbêjan
Teyrê ser milên qîzan û bûkan
Taseke ava sar e way way way

Birîndaro de deng nayê
Birînxedaro lo de deng nayê
Birîna bavê Mihemed Salih giran e
Dinale dinale dinale dinale
Çima bixew nayê way way way
Hahî hahî
Xasê bi sê denga dike gazî
Digo Nazê Nazê digo Bilnazê
Bîlnazê digo lê lê Gulnazê
Sibe ye bi Melazgirê bi gundê
Kevir biketama
Bi hêlîna kewê way way way
Birîna bavê Mihemed Salih sahê
Dengbêjan giran e
Dikim nakim nare fitile milê kewê
Di kêleka min de dinale

www.ersivakurdi.org

Nizanim çima serê min nagire balgê
û qewê way way way

Xasê bi sê denga dike gazî
Digo Nazê Nazê digo Bîlnazê
Bîlnazê digo lê lê Gulnazê
Sibe ye bi Melazgirê bi gundê Kevir
biketama Bi kereng e
Li bejna bavê Mihemed Salih
Şahê Dengbêjan mêze dikim
Li sal û sapika ezê bala xwe bidim
Têlikê tûtikê silîvanî reng e
Li bejna bavê Mihemed Salih mêze
dikim
Kul bikeve mala Zekî Lawê Mîralî
Derbekê Malnihêrî li bedena vî
xweşmêrî daye
îro sê roje ketiye axê
Ez li der û dorê xwe dinêrim
Hezdiyê malê gundê dor heft reng e
way way way

Birîndaro de deng nayê
Birînxedaro lo de deng nayê
Birîna bavê Mihemed Salih giran e
Dinale dinale dinale dinale
Çima bixew nayê way way way
Hahî hahî

www.arsivakurdi.org

Nivîskara swêdî

Astrîd Lîndgren

çû rehmetê



Astrîd Lîndgren di roja 28/1 2002 de li Stockholmê çû rehmetê. Li welatên Bakûr nivîskara here populer bû. Astrîd Lîndgren weke *"qiralîçeya çîrokan"* dihate nasîn. Ne tenê li Swêdê, li hemû dinyayê dihate nasîn. Pirtûkên wê yên zarokan bi gelek zimanan der çûne, pirtûkên wê heta niha bi 76 zimanên cihê li dinyayê derketine, bi qasî 130 mîlyonan pirtûkên wê hatine firotin. Di nav van zimanan de kurdî jî heye. Çend pirtûkên wê li Stockholmê him bi zaravayê kurmancî û him jî bi zaravê soranî der çûne. Pirtûka wê ya bi navê *Pîpîya Goredirêj* çawa tê zanîn yek ji wan pirtûkên wê yên hezkirî ye. Ev pirtûka wek gelek pirtûkên din bûne babetên fîlmên sînemayê jî. Yek ji wan pirtûkên wê di sala 1997'an de bi navê *Keça Şerûd Lotta* di nav weşanên APECê de hatiye weşandin. Bi mîlyonan zarokên cîhanê ev pirtûkên wê xwendine û fîlmên li ser babetên pirtûkên wê mêze kirine.

Astrîd Lîndgren di sala 1907'an de li Vimmerbyê, li navçeyê Smålandê hatiye dinyayê. Di sala 1927'an de bar kiriye û hatiye Stockholmê. Piştî gelek karan di dawiya dawîn de di weşanxaneya *Raben & Sjögren* de kar kiriye. Di sala 1970'yî de teqawit dibe û giraniya xwe dide ser amadekirina berhemên zarokan. Heta niha bi dehan xelat wergirtine, wek di sala 1970'yî de wergirtna *Madalya Zêr ya Mezin* ku ji aliyê Akademiya Swêdê de tê belavkirin.

Astrîd Lîndgren di 94 saliya xwe de mir.

www.kurdi.org

XELATA APECê ya 2001



Di sala 2001ê de jî APECê xelatên xwe belav kirin. Weke sala çûyî îsal jî Xelata APECê ji bo du berheman bû û di *Pêşangeha Kitêbên Kurdî* de hat belavkirin. Peşangeh di roja 15.12.2001'an de weke hertim li bajarê Stockholmê hatibû amadekirin. Xelatên îsal ji bo wergeran bû. Ji wan du berhemên ku îsal bûn xwediyê Xelata APECê, yek wergera Osman Özçelîk û ya din jî wergera Enver Qadir Mihemmed bû.

Osman Özçelîk bi zaravê kurmancî û Enver Qadir Mihemmed jî bi berhemeke zaravayê soranî îsal bûn xwediyên Xelata APECê.

Nivîskarê kurd Osman Özçelîk, bi navê **Rojeke Îvan Denîsovîç** romaneke *Alexsandr Soljenîtsîn* wergerandiye kurdî. Ev berhem di sala 2000'î de di nav weşanên *Avesta*'yê da çap bûye. Enver Qadir Mihemmed jî bi navê **Miyo, Miyokeyê Min** çîrokeke *Astrîd Lîndgrenê* bi zaravayê soranî wergerandiye kurdî û di nav weşanên *APECê* de di sala 1999an de belav bûye.



Juriya xelata APECê ji bo wergera Osman Özçelîk da zanîn ku: *Bi zar û zimanekî xweş, bi gotinên rewan, Osman Özçelîk li wergerandina evê berhemê hûr bûye û pêk haniye. Osman Özçelîk bi nivîs û wergerên xwe yên kurdî yek ji wan kesên nava welêt e ku dixwaze zimanê kurdî bibe marîfeteke malê.*

Juriyê ji bo wergera Enver Qadir Mihemmed jî bi lêv kir ku: *Bi wergêranî çîrokî Miyo, Miyokeyê Min î nûserî gewrey swêdî Astrîd Lîndgren, Enver Qadir Mihemmed berhemekî nayab û rengînî dîkey kirde diyarî bo ferhengî netewekey û bo mindalanî nîştimanekey.*

Xelata APECê weke sala çûyî îsal jî ji bo herdu berheman 20.000 kronê swêdî bû.

www.archivekurd.org

AÇIKLAMA

Haci Erdoğan

Merhaba Değerli Bîrnebûn okuru,

Yazıya başlamak isterken; nereden ve hangi köşeden tutayım derken, en iyisi mi biraz siz saygıdeğer Bîrnebûn'un Orta Anadolu'lu okurlarıyla; yani, Şexbilî, Mifîkan, Sefkanî, Cudkîsî, Canbegî, Bilkîyanı ve daha nice Kürt aşireti mensubu İç Anadolu'lu Kürtlerle, kendi aramızda biraz „hindik gillî" yapayım dedim. Ben neden aşiret ismi verdim diye sorarsanız, hemen söyleyeyim: „Ben İç Anadolu'da aşiret kurumlarının öz itibarıyla çözüldüğünü ama, aşiret isimlerinin ise kimlik ve aidiyetlik kavramlarının içini dolduran soyut sosyolojik özel isimler" olduğuna inanıyorum. Öyle birileri gibi üstten atarak, aşiret kavramlarının önemini yadsıyarak; „Aşiretler feodal kurumlardır" diye söylemiyorum. O nedenle daha da içten olması için siz okurlara aşiretleri de sayarak, özel olarak seslenip, daha samimi bir havada sizlerle „gillî" yapmak istiyorum.

Belki birçoğunuz Bîrnebûn'un dışında başka bir dergi çalışması olduğunu duymuştur. Bu derginin çıkarılmasında benim de katkılarımın ve hatta derginin yazı redaksiyonunda olduğum da basında çıkmıştı. Bazı arkadaşlar ve duyarlı okurlar ne olup olmadığını başta Birnebun çevresi olmak üzere, tüm ilgili taraflardan öğrenmek istediler. Bu da doğal olarak İç Anadolu Kürtlerinin duyarlılığını bir daha göstermiş ve beni birey olarak sevindirmiştir. Neden mi sevindirdi? Çünkü yaptığımız işin ciddiye alınıp, saygı duyulduğunu gördük. Yani Bîrnebûn'u çıkarma fikri oluştuğunda

www.arsivakurdi.org

„delidirler, boş yere kürek çekiyorlar, İç Anadolu Kürtleri sahiplenmez" diyenlerin yanıldığını bir daha görmek sevindirdi.

Ancak Bîrnebûn çıktığından beri herşey güllük gülistanlıktı ve Birnebûn redaksiyonunda herkesde bir aile içinde kendini his edip, diğerini kardeş görüyordu demekte gerçek değildir. Bizler de toplumumuzun içindeki oldu-bittilerden, siyasal gel-gitlerden ve hava koşullarından etkilendik. Bizler farklı insanlardık, şimdi de öyleyiz. Aramızda kırıcı ve hatta birey özünü yaralayıcı söylemler, olmadı değil. Kimileri Bîrnebûn'da kendilerini, istemlerini buldu. Kimileri için Bîrnebûn eksik kalıyordu ve kimileri için ise Bîrnebûn zararlıydı. Ben bir işin başlangıcından itibaren herşeyin dört-dörtlük olacağını savunmadım. Zaten, „Bîrnebûn tek çıksiin da eksik olsun" mantığıyla yola çıktım. Nasıl olsa yolda tamirini yapar ve yoluna devam eder düşüncesindeydim. Böyle de oldu şimdiye kadar. Ancak birçok arkadaş artık bunun böyle olmayacağını ve yeni bir arabanın alınması gerektiği düşüncesindeydi ve o arkadaşlar da şimdi araba alma uğraşısı içindedirler. Benim de ortak olmamı istediler ve ben ilk dönemler salt Bîrnebûn'a karşı çıkılmaması koşuluyla kendilerini destekleyeceğimi, iki derginin bir yarış yaratacağını ve bunun da kalitede ve hizmette önemli mesafelerin Orta Anadolu Kürtleri için katedilmesini sağlayacağını belirttim. Ancak bu arada da Bîrnebûn'daki arkadaşlarla kendi iç sorunlarımızı masaya yatırmak ve hatta gerekirse Bîrnebûn'dan çekilmeyi dahi göze aldım. Ancak düşündüm, taşındım ve arkadaşların da beni bu yönlü etkilemesi ile, karar vermede acele etmemem gerektiği yönünde karar aldım. Bu aşamadan sonra sorunlarımızı çözmek için; belli yapısal değişiklikleri, hedefleri belirleyerek; ileriye yönelik projeleri hayata geçirmek bence Bîrnebûn'dan ayrılmaktan daha önemlidir diye düşünüyorum. Bence en önemli olanı alçakgönüllülüğü elden bırakmayarak, Bîrnebûn'un bugüne kadar yaptığı olumlu şeyleri görüp, ileriye yönelik projelerin hayata geçirilmesine destek vermek olmalıdır benim görevim.

Bîrnebûn'u çıkarmak için yola çıkarken hiçbir bireysel çıkar düşlemedim, zaten bireysel çıkar olamazdı da bugün de düşlemiyorum. Hep kendi özel hayatımdan taviz verip, salt Orta Anadolu Kürtleri'nin de toplumda hakettikleri yeri almaları idi esas amacım. Neden mi? Onu da bir başka yazıda daha derin, detayları ile irdelemek üzere ve bu yolla da sizlerle tekrar buluşmak üzere esen kalın.

www.dersimkurdi.org

Kürtçeye Özgürlük!

Kürt öğrencileri anadilde ders talep ediyor!

Nuh Ateş

Türkiye'nin değişik üniversitelerinde okuyan Kürt öğrenciler bir süreden beri, Kürtçe'nin seçmeli ders olarak öğretilmesini talep eden bir kampanya sürdürüyor. Bu amaçla çeşitli etkinliklerde bulunan öğrenciler, toplu ve tek tek yetkili mercilere dilekçe verdiler.

Üniersite yönetimleri, verilen dilekçeleri geri çevirerek veya almayarak, başında bulundukları kurumların asli görevlerine yakışmayan, yasakçı bir anlayış sergiliyor. Dilekçe sahibi öğrenciler suç işlemiş muamelesi görüyor ve güvenlik güçlerinin engelleme, baskı ve tutuklanmalarına maruz kalıyor.

Anadilde eğitim talebi, yer yer çocuklar ve velileri tarafından, orta dereceli okullar için de talep ediliyor.

Her zaman olduğu gibi, bu kez de ülkenin „bütünlüğünü" ve „güvenliğini" koruma gerekçesiyle Kürtçe`nin özgür olmasına, eğitim kurumlarında ve basın-yayın alanında serbestçe kullanılıp öğrenilmesine karşı çıkılıyor. Böylesine çağdışı bir anlayışın, ülke bütünlüğü ve güvenliğiyle ne gibi bir alakası olabilir?

Kürtçeyi yasaklamak, onun öğrenilmesini ve onunla yayın yapılmasını engellemek yoluyla, Kürtlerin aidiyet duygusunu ve kültürel kimliğini aşağılayıp yaralamanın, ülke bütünlüğünü ve güvenliğini sağlamaya katkısının olabileceğine inananların, akli dengesinin yerinde olduğuna inanmak için deli olmak gerekir.

Bir an, Kürtçe eğitim talebinin, sıkça ileri sürüldüğü gibi, kimi Kürt siyasi çevrelerince siyasal amaçlarla istismar edildiğinin varsayılması halinde bile, Kürtçe'nin serbest kılınması ve böylelikle istismarın önlenmesi gerekmez mi?

Ya da, Avrupa Birliğine üyelik sürecinde, örneğin, „Katılım Ortaklığı Belgesine" atfen çıkartılan „Ulusal Program"da Kürtçe'nin

www.arsivakurdi.org

serbestçe kullanılıp öğrenilmesinin yasal biçimde düzenlenmesi taahüt edilmiş olsaydı, o zamanda öğrencilerin sözü edilen eylemlerine gerek kalmayacaktı ve ileri sürüldüğü gibi, dil istismarının önüne geçilmiş olacaktı. Ama yapılmadı ve yasaklara devam edildi. Yasakların kaldırılmasını tep edenlere ise terörist muamelesi uygun görülüyor. Ve bunun adı da, kendilerince ülke bütünlüğünü ve güvenliğini sağlamak oluyor.

